

Li Kurdistanê pêla terorek nuh

- Li Kurdistanê zilm û îşkence berdewam e
- Di operasyonan de bi sedan kes hatin girtin
- Li gundê Yeşilyurdê "pîsiya însanan" bi gundiyan dan xwarin.

Bi bahana kuştina du polîsan li Cizîrê, dewleta Tirk li hemû herêma Başûrê Kurdistanê Tirkîyê operasyonên leşkerî pêk anî. Operasyon bi taybetî li gund û qezayên Mêrdîn, Sêrtê û Diyarbekirê çêbûn, bi sedan kesên bêgûneh hatin girtin, lêdan îşkence û zilm li gundiyan Kurd hatin kirin.

Li gor nûçeyên rojnaman di van operasyonan de zêdeyî 350 kesî hatin girtin û di nava wan de endamên Partiya Sosyal Demokrat jî hene.

Li ser girtin û îşkencan Partiya Sosyal Demokrat heyetek parlamenter şand Kurdistanê. Li gor vê heyeta parlamentoyê bi taybetî li Cizîrê û li gundên Cizîrê îşkencê û tadeyek pîr mezin li gundiyan kiribûn. Muxtarê gundê Yeşilyurdê Abdulrehman Muştak di axafina xwe ya bi parlamenterê SHP'ê re digot ku di 15'ê Çileyê Paşin de leşker û polîs dora gundê me girtin û hemûyên gundiyan li meydana gund topkirin. Û bi min û bi malbata min 'pîsiya însanan' dan xwarin û gundî dan ber sîle û qundaxên tîngan. A. Muştak dibêje, ev 9 sal e ku em di bin zilm û zora eskeran de ne û dawiyê jî 'pîsiya însan bi me dan xwarin.

Dibistana gundê Yeşilyurdê bûye qîşla eskeran û li Cizîrê tenê zêdeyî 100 kesî hatiye girtin.

Wexta li Kurdistanê ev operasyon dibûn, Wezîrê Hundirê Tirkîyê, waliyê herêma Kurdistanê û berpirsiyarên leşkerên Tirk li Enqerê civiyan û li ser hin tedbirên din biryar girtin.

Ji aliyê din jî li bajarê Sêrtê di nava sergoyê bajar de termên însananê kuştî hatin dîtin. Waliyê herêma Kurdistanê H. Kozakçioğlu



Ji aliyê de Elîyê şofêr îşkenceyê nîşanî mebûs dide, ji alî dîn de serçavê xwe digre, ji bo carek dîn neyê îşkence ktrin.

lu got "Haya min ji wan terman heye û sê terorîst in", lê belê xelkê bajêr endîşe dikin ku di nav sergode termên kuştîyan pirtir in.

Tiştê ku li gundê Yeşilyurdê nê kirin numûneyek ji îşkence û

Dûmahîk r. 11

- Konferansa Stockholmê ya Kurda
- ★ Dîtinên ronakbîrên Kurd li ser Konferansê
- ★ Axaftina TEVGER'ê

rûpel: 2 û 3

- Rewşenbîriya netewî û problemên wê

rûpel: 5

- Konferansa Parîsê ya Çekên Kimyayî

rûpel: 12

TEVGER:

Dema hilbijartinê firsetek e

Di 26'ê Adara 1989'an de li Tirkîyê û li Kurdistanê Tirkîyê hilbijartinên ji bo belediyan çêdibin. Komîta Birêvebîrîna ya TEVGER'ê di Çileyê Pêşinê 1988'an de, li ser rewşa Tirkîyê ya hilbijartinan rawestîya û beyanek ji bo kar û barê dema hilbijartinan derxist. Em li jêr beyanê pêşkêşî xwendevanan dikin:

Ji bo raya giştî ya pêşverû û demokrat

Ji bo gelê me yê welatparêz

Roja 26'ê Adara 1989'an li Tirkîyê hilbijartinên herêmî çêdibin. Helbet, wek yê berê, ev hilbijartin jî di warekî demokratîk de pêk nayên.

Li Tirkîyê, di karekera rejîma faşîst de tu guhertin çê ne bûye. Destûra esasî ya 1982'yan a ku armanca wê rakirina maf û azadiyên hîmî bû û qanûnên zordariyê yê ku li gor wê hatin derxistin

Dûmahîk r. 11

Daxwaza du parlamenterên Swêdî

Divê Hukûmeta Swêd alîkariya Kurdan bike !

"Eger ku li Rojhilata Navîn aştîyek bi îstîkrar tê xwestin ew bîyî qebûlkirina heqê Kurdan ne mumkun e".

Nûçeya wê di r. 11'an de

Prof. M. Hasretyan:

"Serîhildanên Kurdan Milî Bûn"

Nûçeya wê di r. 9'an de



Prof. Hasretyan di 29'ê Çileyê Paşin li Stockholmê semînerê da. (Foto: Armanç)

Rojeva Mehê

Durrûtî li pêdarê ye

Konferansa Parisê li ser qedexekirina çekirin, depokirin û bikaranîna çekên kimyayî bi belavokekê dawî li civîna xwe ani.

Konferans li ser pêşniyariya Serokdewletê Fransa François Mitterand a îlona derbasbûyî pêk hat. Her weki tê zanîn, gurrûbûna munaqesên li ser çekirin, bikaranîna û depokirina çekên kimyayî, piştî erîşên çekên kimyayî yê rejîma Iraqê yê ser gelê Kurd dest pê kir. Qetliama Helepçê û qirkirin û surgûnkirina herêma Behdînan bi çekên kimyayî, xof û tirs û nefretek mezin di nav raya demokratîk û aşîxwaz a cihanî de peyda kiribû. Ev bû sedemê wê yekê ku gelek hukûmet û berpirsiyarên siyasî, nerazîbûna xwe li hember bikaranîna çekên kimyayî diyar bikin. Wê demê berpirsiyarên dewleta Amerika, Engilistan, Fransa û hinên din, dan eşkerekirin ku rejîma Iraqê li dijî Kurdan çekên kimyayî bikaraniyê û xwedêgiravi wê li hemberî vê yekê serî li hin tedbiran xistina.

Lê piştî demek kurt, dengê van hukûmetan biîtya nema behsa bikaranîna çekên kimyayî ya li hemberî gelê Kurd kirin.

Konferansê jî li ser vê hîşbûn û kerrbûnê dest bi kar û barê xwe kir. Bi rojan guftûgo li ser çekirin, depokirin û bikaranîna çekên kimyayî bûn lê gelek mixabin wek çend meh berê ev çek jî alî Iraqê ve nehatîbin bikaranîn, wek 5000 Helepçeyî jî van çekan şehîd nebûbîn, bi deh hezaran Kurd ci û warê xwe terk nekiribîn, tu kesî ne behsa wan kir, ne jî Iraq rûreş kir. Iraqa hov û rûreş jî tevî civînê bû, îmze avêt bin belavoka dawiyê.

Li ser navê Kurdan heyetek jî negirtin civînê, ku derd û êşên gelê Kurd û rûreşîya rejîma Seddam pêşkêşî Konferansê bike. Lê ne tenê Iraqê, ew dewletên ku bi teknik û imkan û rêvekirinê alîkariya Iraqê jî bo çekirina çekên kimyayî kiribûn jî, radibûn li ser qedexekirina van çekan nutuq davêtin.

Civîn, civîna xwedêgiravi parastina gelan bû. Lê ne gelê ku bi van çekan dihat kuştin, qatîlên vî gelî li meydana bûn, birre birra wan bû. Pez di nav gerreka xwînê de digevîzî, gurên devbixîn jî derketibûn serê zinaran dizûriyan.

Hey gidi dinya hey! Tu çi dinyayî ku ber bi 2000 salan ve pê davejî, hînge-dînga defa aşî, edaletê, azadi û wekhevîyê ye li ser te, lê disa dewr dewra quwet û menfetê ye. Durrûtî li pêdarê ye toz û dûmanê bi ser xwe dixe!

Redaksiyon: M. Elî, Zinarê Xamo, Hesên Mizgîn, Lewend Firat, Mîrza Bextiyar.
Redaktorê berpirsiyar: M. Elî
Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanij

Di riya hevkarîya Komelên Kurdan de gavek nû:

Konferansa Sto

Bi însiyatîfa Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê di navbera 13-15'ê Çileyê Paşîn de bi navê "Konferansa Stockholmê" konferansek çêbû. Di konferansê de jî 8 welatên Ewropayê 9 komel û mueseşên demokratîk ên Kurdan û pîsporên Kurdan beşdar bûn. Komelên ku di konferansê de hazir bûn ev in: Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, Malbenda Rewşenbîriya Kurdî-Engilistan, Enstîtuya Kurd li Parisê, Federasyona Komelên Karkerên Demokratên Kurdistan(KKDK) -Almanya Federal, Têkoşer-Belçîqa, Navendiya Kurdistan-Arnhem/Hollanda, Komela Kurd li Aarhus-Danimarka, Akedemiya Kurd li Almanya Federal; UKSYE-Berlîna Rojava. Berpirsiyarên van komelan dîr û dirêj li ser pîrs û pîrsgirêkên civata Kurdan a dervayî welat munaqesê kirin.

Herweha berpirsiyarên partiyeş Swêdî ku di parlamentoyê de temsîl dibin, berpirsiyarên Wezareta Biyanîyan û Daîra Biyanîyan, Ji Piştigiriya Komîta Kurdan Hans G. Franck û Serokê Rêxistina Parastina Zarokan Thomas Hammarberg jî di konferansê de axiftin. Li ser navê Têvgera Rizgariya Kurdistan(TEVGER) Sekreterê Giştî yê PPKK Serhad Dicle û berpirsiyarê Cepha Kurdistanê Iraqê Dr. Mecîd Cafer di konferansê de axiftin.

Konferans; li ser sebebên hatina



Konferans bi merşa milî Ey Raqîb qediya.

Kurdan li Ewropayê, a ser rewşa karkir, penaber, jin, zarok û ciwanên Kurd, li ser rewşa çapemenî û kultura Kurdî li Ewropa û li ser rewşa rêxistinên demokratîk ên Kurdan û pîrs û

pîrsgirêkên hevkarîya di navbera wan de, sekinî.

Piştî sê rojên konferansê, Komîta Konferansê deklarasyonê belav kir: Li gora vê deklarasyonê konferans jî

Dîtinên Ronakbîrên Kurd li ser Konferansa Stokholmê

Mustafa Duzgun(Berpirsiyarê Kovara Berhemê): Ji bo komelûna konferansê ku komelên demokratîk hatine cem hev û li ser pîrs û pîrsgirêkên Kurdên li Ewropayê dijin mijûl bûn, danûstendin, bi rastî wek mebest konferansek xweş bû. Civîna konferansek ewa ji bo me şahiyek e. Ez hêvîdar im problemên ku ev konferans dixwaze safî bike ji bo me di cihê kêrhatî de pêk bên.

Selîm Keya(Serokê Yekitiya Sosyalîst a Kurdistan): Konferansa ku ji alî Federasyona Kurd li Swêdê pêk hatiye, bi rastî di kar û barê Kurdistanê de, gaveke gelek girîng e. Dîtin min ev e ku, di Konferansa Stockholmê de kes û komelên ku hatibûn gazîkirin li ser gelek pîrsên Kurdan yê Ewropayê rawestiyân. Dîtin min ev e ku ev kar û bar jî tevgera rizgarîxwaz û azadîxwaz a Kurdistanê bi taybetî ji bo xebata siyasî bingehek baş pêk bîne. Rojên pêşî pewîst e ku hemû hêzên siyasî yê Kurdistanê bi taybetî ji TEVGER jî gavên weha re xwedî derkeve, tê de cî bigre, pêşengî, hevkarî û alîkariyê bike.

Mahmûd Baksî (Nivîskar-Rojnamevan): Bi rastî ev cara yekem e ku konferansek weha fireh û meriv kare bêje bi resmî ji alî muese-

sek Kurd ve pêk tê, ev gaveke pîr baş e. Ev civîn ne tenê ji bo ziman û edebiyata Kurdî menfeet dide, her wisa ev sê roj e siyasîyên Kurdan jî aniye ber hev. Ez hêvî dikim ku ev bibe tradîsiyonek, her sal bê tîrêj kirin. Ger ku rêxistinên me li her derê Ewropayê bi hev re kar bikin wê dengê me bigihê hemû Ewropîyan.

Mehmed Uzun (Nivîskar): Konferans karekî hêja ye di warê yekîtî û bi hev re karkirinê bi rêxistinên demokratîk, mueseşên Kurd yê edebî, civakî û hwd. Di vî karî de Federasyona Komelên Kurd li Swêdê însiyatîfek baş girtiye. Hêvîdar im û bawer im ku ev konferans dê bibe gavek yekemîn di warê xebatê de, imkan peyda bike ku ev rêxistin, mueseş û şexsiyet bi hev re kar bikin.

Mueyîd Teyîb(Şair): Bi rastî ez di hemû rûniştinên konferansê de hazir nebûm. Lê tiştê ku min ji hevalan bihîst ev kar devam bike wê bige armanca xwe.

Celaded (Serokê Komela Doktoran): Roja duduyan û sîsiyan pîr tişt li ser rewşa muhacîrên Kurd hatin gotin. Ji bo min têde tiştên nû hebûn. Gavek awa cara yekemîn tê avêtin, pêwîst e pîr hêviyên mezin meriv jê neke. Ku di vê konferansê de bi kêmasî Kurd bîn ber hev û li hev

guhdarî bikin û ev pîrs û pîrsgirêkên xwe yê mûsterek karibin munaqesê bikin bi serê xwe gavek pêş e. Lê gelek dîtinên balkêş jî hebûn ku bala merivan diqşand. Mesela dîtin hevalê ku digot di sala 1992'an de ku li Ewropayê bazarek mûsterek çêbibe, wê li ser mesela eqaliyetan û li ser mafê însanan, rewşa muhacîran guhertinek çêbibe, pêwîst bû konferans li ser vêya bêtir bisekine.

Kêmasiyek din ev e ku hinek komelên din nehatibûn konferansê ku ev komîte yan jî komîsyon di dawîya civînê de bê avakirin, bi wan komelan re jî têkilî deyne, wan agahdar bike, pêşniyarên wan jî bigre ji bo ku karibin gavên nû bi hev re bavêjin.

Cemşîd Heyderî (Nivîskar): Bê guman ev konferans gavek girîng e di jiyana Kurdên Ewropa de. Konferans li ser sê xala sekinî. Xala yekem; mesela karkirên Kurd li Ewropa û ji bo vî karî çî bê kirin. Xala du-duyan bar û problemên muhacîr û penaberên Kurd û xala sêyem di mesela ziman û kultur de hevkarîya di navbera komelan da.

Bê guman konferansek ewa yekem car peyda dibe. Federasyona Kurd li Swêd karibû zûtir hemû komelên Kurd li Ewropayê agahdar bikira, pro-

Adres : Armanç
P. Box: 6004
172 06 Sundbyberg / Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC
Telefax: ATTN ARMANC 46-8-208006

Ansvarigutgivare:
Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9, ISSN: 0348 7385

ckholmê



(Foto: Azad Perwer)

bo çareserkirina problemên Kurdên Ewropayê ev biryarên jêrîn standin.

- Ji bo danûstendinê, bi navê

"Komîta Koneferansa Kurd-Stockholm" komîteyek hat avakirin.

- Ji bo xurtkirin û berdwamiya hevkarîya di navbera rêxistinên de biryar hat girtin.

- Ji bo çareserkirina problemên Kurdên li Ewropayê wê salê carekê konferansê bicive.

- Konferans piştigirîya xwe bi tevgera rizgarîxwaz a li her çar perçên Kurdistanê, diyar dike.

- Konferans piştigirîya xwe bi berxwedanên girtiyên Kurd diyar dike.

- Konferans ji alî Irqê ve qirkirina gelê Kurd bi çekên kîmyayî bi tundî protesto dike.

- Konferans politîka muhacîrkirina gelê Kurd protesto dike.

- Konferans bala dengê giştî yê cihanî dikşîne ser neheqîya li ser Kurdên ku li Almanya Federal û li Hollandayê dijîn, ku li van welatan hebûna Kurdan wek grûbek netewî û serbixwe nayê nasîn û Kurd ji piraniya mafên ku biyanîyên din hene, bêpar in.

Di dîroka komelên Kurdên Ewropayê de cara yekem e ku ji gelek welatê Ewropayê komelên demokratîk ên Kurdan tîn cem hev û li ser pirs û pirsgerîkên xwe yê dervayî welat diaxifin û biryara hevkarîyê digrin. Di vî warî de konferans gawek nû e.

gramekî ronî pêşkêşî komela bikira, ji ber ku di konferansê de di hin peywendiyên de program ne zelal bû. Duyemîn, dezgehên rageyanî zor kêr bûn, ne TV, ne radyo, ne jî rojnameke Swêdî beşdarî nekiribû. Federasyonê karibû ev konferans bikira video û wek dokument bimana. Ev komele û mueseşên Kurdan ku di konferansê de hazir bûn pêwîst bû ne tenê înfarmasyon bidana, divê lêkolînek zanistî li ser problemên Kurdan pêşkêşî konferansê bikirana.

A. Riza Alan (Rojnamevan): Ji vî konferansê ez sê dersa derdixim. Di nava civata Kurdên Ewropayê de divê kordinasyonê hebe. Ji bo problemên me yê civakî bi hawakî mustereke û merkeza bîrê helkirin. Ya duduyan; ber bi raya giştîya Ewropayê ve divê em karibin bi dengê herin. Di mesela humanîter de ji bo Kurdên Ewropayê rûreşîyek pîr mezin e, eger em bi kêmasî nikarin ku 9-10 milyon dolara alîkariya 100 hezar êşîrên xwe li Tirkiyê di nava çadîran de dijîn bikin.

Di van her sê waran de her kes xebateke xurt dixwaze. Problemên ku di vî konferansê de derketin, çima ev xebat nayên pêkanîn, ev meseleyek bingehtî ye. Li Fransayê Enstîtuya Kurdî heye, serokê enstîtuyê bi xwe got, mûmkûne em nikarin bikevin vî xebatê. Ez bi konfederasyonê, federasyonê bawer nakim. Ji ber ku konfederasyonê federasyonê divê li her welaî wê Swêd bîrê avakirin. Lê belê şertên wan welatan ne wê yê Swêd e, bêguman dibê avakirin ji li gora şertên wan welatan be.

Ji ber wê ez meclîsek e milî ber bi hiştir dibînim ku çiqas organîzasyonên Kurd çî siyasî çî demokratîk, çî mueseşê li Ewropayê hene di vî meclîsê de bicivin.

A. Diljen (Mamoste): Bi rastî di warê demokratîk de, hatina ewqas Kurda ba hev û bi hev re munaqesekirina hinek pîrsên Kurdên dervayî welat, gawekê heja ye. Lê divê mirov bi vî gavê serxweş nebe û kêmasiyên jî diyar bike.

Bi ya min kêmasiyên konferansê ev bûn:

1- Konferans; bû wek platforme gili û gazincan. Di vî manê de bîrê netîce dihere.

2- Berî konferansê divê li gor babetan an jî li gor xalên rojevê komîsyon bihatana avakirin.

3- Komîsyona biryaran jî nehatiye avakirin. Ji bo biryaran hinek pêşniyar bi devkî, hinek jî bi nivîs hatin kirin. Lê, li ser van pêşniyaran di konferansê de dengdan çênebû. Gelo kîjan pêşniyar wê wek biryarên konferansê bîrê ilankirin?

4- Deklerasyonê konferansê, di konferansê de nehat xwendin û testîq nebû. Ji xwe deklarasîyoneke weha jî tunebû. Divê ya komîta hazîrkirina konferansê yan jî komîteke ku ji aliyê konferansê hilbijartî deklarasîyoneke weha hazîr bikira û belav bikira.

5- Bi navê pîsporiyê hinek kes hatibûn dawetkirin. Lê hinek ji van di konferansê de peyvek jî negotin. Gelo pîvanên komîta avakirina konferansê di heqê pîsporan de çî bûn?

6- Di warê mafê nûner, mêvan û guhdaran de jî tevliheviyek hebû.

Li ser navê Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER) axaftina Sekreterê Giştî yê Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK) Serhad Dicle di Konferansa Stockholmê de.

Gelî endam û mêvanên ezîz

Hevalên heja

Civandina konferansê li ser pîrs û pirsgerîkên civaka Kurdan a li dervayî welat, karekî qenc û ciyê kêfxweşiyê ye. Bernameyek pîr-mijar û giran ji bo konferansê hatiye amadekirin. Carna giranî û pîrbabetiya bernamê, dikare zahmetiyê têxe ronîkirina munaqesê û bersîvan. Bi baweriya min wê encamên konferansê bi xêr û bêrtir buya eger li pêşîya konferansê jî sisiya yekê bernamê, heta bes maddeyek vî bernamê hebûna.

Lê dîsa ev destpêkek e ji bo Federasyonê Komeleên Kurdistan li Swêd. Gûman tê de tune ye ku li ser pîrsan wê bîr û baweriyên heja û guftûgoyên payebilind bîrê pêşkêşkin. Bi hêviya ku konferans bigihê armanca xwe û bi ser keve û bi saya vî firsêda ku federasyonê daye me, dixwazim li ser hin pîrsên Kurdan di warê rêxistinî de, bîr û baweriyên Têvgera Rizgariya Kurdistanê pêşkêşî civîna we ya heja bikim.

Gelî hevalên heja

Miletêkî bîrê rêxistinê wek ordiyek bîrê silah e. Ne bîrê sedem e û gelekî di cîh de ye ku hatiye gotin. "Miletê xwe rêkneştî, miletekî kole ye".

Em di dinyak wîlo de dijîn ku pêşveçûna ilim û teknîk di jîyan û peywendiyên miletê cihanê de qonaxek nîpînuh peyda kiriye. Buyer û rûdanên dinê ewende zû tîn guhertin ku carna guhertinê çend rojên dema me ya îroyîn jî guhertinê dema kevn ên bîrê sedalan mezintir in. Dinya me piçûk bûye, tîkiliyên milet, gel û dewletan jî her demê bîrê, kompleks bûne û ketine nav hev. Her milet, gel an dewlet li gor rewşa xwe û berjewendiyên xwe, ji bo ku karibe serî di vî zûguhertinê û van tîkiliyên pîr alî û kompleks re derxe, di hewlek bêrawestan de ye ku dinya îroyîn; buyer û rûdanên îroyîn çî jî dixwaze li gor wan xwe amade bike, li gor wan xwe rêk bixwe mueseşên li gor wan ava bike. Her milet, gel an dewlet hewl dide da ku ne bes bibe mefûlê buyer û rûdanan, her wiha bibe failê wan jî bibe yek ji avakirên jîyana dinya me ya îroyîn.

A di dinyak wîlo de em miletê Kurd, hîn miletekî bindest û perçekirî ne. Em ji hemû mafên xwe yê milî û demokratîk, ji hemû mafên xwe yê însanî bêpar in. Heta niha hebûna me jî nayê qebûlîkirin, lê zîlm û zordariyek nedîtî li ser me ye. Em li welatê xwe bîrê welat, li penaberîyê, biyanîyên bîrê nav û nîşan in. Yanî em miletekî kole ne, ordiyek bîrê çek in. Tîştê ku buyer, rûdan û rewşa cîhana îroyîn jî mileta dixwaze me xwe li gor wê amade nekiriye, ew rewşa rêxistinî, avayî û mueseşên ku di dinya îroyîn de me jî mefûluyê derxînin, bikin failê jîyana îroyîn di nav me de nînin. Loma jî destvala, em serî di buyer, rûdan û peywendiyên pîralî yê dînyayê re dermaxin.

Bi kurtî, em miletekî bîrê rêxistin in, loma jî em kole ne. Gava ez behsa hebûna rêxistinî dikim, bîrê qet neyê bîra we ku ez bes qesda rêxistinîya siyasî dikim. Helbet di hebûn, tîkoşîn û biserketina miletan, çî û tebeqên miletan de jîyana rêxistinîya siyasî, tîşteki esasî ye, bîrê neyê ye, bîrê jîyan û tîkoşînê rêxistinîya siyasî nabe. Lê bes pişbestina bi xebat û jîyana rêxistinîya siyasî jî wek meriv her roj savara rijî bixwe. Însanekî ku her roj savara rijî bixwe nikare jîyana xwe bîdomîne, jîyan ne xwarina savara rijî ye.

Civaka miletan pîralî ye. Çî û tebeqe tê de hene; karkir, gundî, esnaf, senetkar, tacîr û xwedî kargeh û xwedî dezge hene. Di civakê de mîr û jin, kal û navsere, ciwan û zarok hene, xwendevan, nivîskar, hunermend, alim hene. Bîrçî, belengaz, bêkar, nexweş, bêxanî û war hene. Hefsî, penaber, pêşmerge hene. Jîyana aîletî heye. Ev hemû kategoriyên civakê ne, her kategoriyek li gor xwe xwedî pîrsgerîk e. Ji miletekî re jîyana aborî, entelektuelî, manewî, siyasî lazîm e. Tîrbûna zîk û ruh lazîm e. Problemên perçebûna welat, perçebûna eşîrî, dîni, mezhebî û terîqetî

hene. Cudatiya çîni û tebeqetî, cudatiya navbera zaravan dijayetiya navbera kevnêşopî û rêça jîyanek nû heye. Û tevî van jî bo me Kurdan bîndestiya milî heye. Ev hemû û bîrê hezaran pîrs û pîrsgerîkên wek van radixin ber çavê me ku gava em behsa jîyana rêxistinîya miletê dikin qesta me jî ne bes rêxistinîya siyasî ye. Ji bo ku em karibin van meselên jorîn û yê wê wan çareser bikin, hin rêxistin avayî û mueseşên din pêwîst in. Ji bo çareserkirina her pîrs û problemekê, rê û dirb û mueseşên li gor wê divê hebin. Yanî hebûn, jîyan, biserketin û pêşketina miletekî çî rê û dirb û mueseşan dixwaze divê em bibin xwedîyê wan. Eger ev kêr an tunebin, me'na wê ew e ku kêrî, qelsî û bêçaretî di miletbûna me de jî heye. Çewa jî bo hebûna însanekî, bes hestiyê skeletê nake, goşt û xwîn û mejî, çav û dev, kinc û tîştên din lazîm in, ji bo miletekî jî her wiha ye.

Gava em behsa jîyana rêxistinîya miletekî dikin û xebata milî dikin divê em vî yekê bîrê berçav û li gor wê gavan bavêjin.

Gelî endam û mêvanên heja

Li ser ihtîyacî û pêwîstiyên miletbûnê, li ser serkeftina milî û jîyanek milî ya azad û pêşketî gelek tîşt dikarin bîrê gotin. Lê niyeta min ne ew e ku peyva xwe dirêj bikim, wexta we ya heja serf bikim û serê we biêşînim. Ji xwe bernamê û dema konferansê jî cîh nade axaftin û munaqeseyek dîr û dirêj.

Gava 8 partî û rêxistinên siyasî jî bo avakirina Têvgera Rizgariya Kurdistan gaw avêtin li gor bîr û baweriyên jorîn dest bi kar kirin. Baweriya TEVGERê ew e ku divê ev tifaq bi 8 partî û rêxistinên nemîne, rêxistin û partiyên din jî di yekîtiyek wiha de ciyê xwe bigrin. Jê pêştir TEVGER ne di wê baweriyê de ye ku ev yekîtiyê hêzên siyasî bi tenê pêk bîrê. Divê sendîka, kope-ratifên an yekîtiyên gundiyan, akademî û enstîtuyên Kurdan, komelên aşî, mafên mirovayî, ên xwendekaran û jinan, ên nivîskar û hunermendan jî di vî de ciyê xwe bigrin. Kesên serbixwe divê ciyê xwe di TEVGERê de bigrin. Destûra TEVGERê li gor van esas û bîr û bawerîyan hatiye amadekirin. Yanî li gor TEVGERê mesele, mesela bîrêxistinîya miletekî ye.

TEVGER her wiha rewşa, perçebûna welat, digre ber çav. Siyaseta wê ew e ku tîkîlî, piştigirî û alîkariyê bi tevgerên perçên din ên Kurdistanê re deyne, li gor rewşa îro çî tî xwestin, tifaq, rêxistin û platformên lazîm bîrê avakirin.

Ji bo nasandina doza gelê Kurd, xurtkirina piştigiriyê pê re li dervayî welat, çî lazîm e divê bîrê kirin, çî mueseşên milî pêwîst in divê bîrê avakirin. TEVGER bi wê yekê re ye ku li her welatên Ewropa, komelên Kurd di bin yekîtiyê de xwe bighînin hev, komelên Kurd bi wî awayî bîrê avakirin ku hemû Kurd ciyê xwe tî de bigrin, temsîla milî ya Kurdan di wan welatan de pêk bîrê.

Em her kes, her daîm gazîna jî hêzên siyasî dikin ku çîma xwe nakin yek, cephan ava nakin û xebatê pêş de nabin. Lê em jî bîrê dikin ku yekîtiya miletekî bes ne yekîtiya siyasî ye. Nivîskar, ronakbîr, hunermend, doktor û alimên Kurdan gelo qet nafikirin ku milet muhtacî yekîtiya wan e jî. Rojnamavanên Kurd, ma milet ne muhtacî ajansêk xurt, rojname û kovarên, bultenên înfarmasyonê yê zîmanê curbe cur û bîrê Kurdî ne. Gelo di van waran de em ne muhtacî mueseşan ne?

Li gor bîr û baweriya TEVGERê bîrê van nabe. Divê em jî rehawet û xemsariyê derkevin, her kes li gor rol û quwet û zanebûna xwe, xwe bîrê avakirina mueseşên milî yê Kurd. Her tîşt li hêviya me ye, tu kesên din wê neyên, barê me hilnedin. Ên ku bar hildin em bi xwe ne.

Bi hêviya serkeftina kar û barê Federasyonê û yê we hemû guhdarên heja.

Sipas ku we firsêta vî axaftinê da me û guhdariya me kir.

□

RAMANÊN RAMANWERAN

Folklora Kurdî

J. Kurdo

Di nava babeta folklora Kurdî de ya herî tê tercîhkirin çîrok e. Di ser piraniya wan re hezar sal derbas bûne. Ji xeynî çîrokan, pêkenînen ku kêmasiyên mirovan cuda cuda bi ken didin diyarkirin ên herî populer in. Çîrok-efsanên zarîf û zîrek in ku di naveroka xwe de hîkmetên heja û şîretan ihtîwa dikin. Çîrokên sihirî ku bi her hawe cin, perî, cinawir û mexlûqên ecêb ve girêdayî ne, Kurd wan tercîh dikin ku qehremaniya efsanên kevnê wan bêjin. Di nava wan de ya herî tê heskirin, efsana Kawayê Hesinger û serîhildana wî ya li dijî serdestê zalim e (ku ew niha di nav Kurdan de di 21'ê Adarê de). Ev efsane di folklora Kurdî de herî meşhûr e û di demek gelek kevn de pêk hatiye.

Li gora vê efsanê di wextê xwe de qiralekî zalim hebûye ku li ser milên wî du mar peyda bûne. Ji wan maran her yek her roj bi mêjiyê xortekî dihat tîr kirin. Di vî warî de hejmara xortên ku bûne qurban gihîştîye hezaran. Carekê ji xelkê du kesên dilxwaz xwestine ku ji dêvla du mêjiyên xortan mêjiyekî bi mêjiyê miyê ve tevîhev kin û bidin qiral, bi vî hawayî xortekî ji qurbanê xelas bikin. Û pêwîst bûye ku ev xort ji alî xelkê ve li çiya bê veşartin. Li gor efsanê Kurd lawê vî ciwanî ne. Û wexta sebra xelkê diqede, ew di pêşengiya Kawa de serî hildidin û qiralê zalim dikujin.

Qasî vêya kevn ji Zal û Lawê wî Rustem û hwd. jî hene. Efsanên Kurdî bi babetên xwe yên cuda cuda û edebiyata xwe ya bilind û delal dikevin derca eserên folklorî yên cihanê. Sebebên vê nedîtîya cazîb dewlemen-diya motîvên repertoara şîra Kurdî ye ku di hundirê xwe de vedişêre.

Wek me got, xelk buyarên reel û şexsiyetên dîrokî ku di tarîxa Kurdan de rolek mezin leystine meth dikin û wan qehremanan bi efsanan û bi qeweta nedîtî ve girê didin. Li gor efsanan, ev qehreman pirrî caran li hember leşkerên dijmin xuyanîdikin û wan paşde direvînin. Bi taybetî di hemû efsanan de ciyekî bi rûmet didin hespê qehremanên efsanê -ku hesp hevalbendê qehremaniyê ye-. Û ew di efsanan de wek teyr difire. Di efsanên Kurdî de hesp sembolîzekerîna gel e. Hemû buyarên girîng ne mumkûne ku di şûra gel de sopekê nehêle. Ew bi stranên xwe, mîrxas û qehremanên xwe yên welathiz ku di qirnê kevn û nuh de jiyanê, tîr ebedîkirin.

Efsana "Dimdim" girêdayî buyera ku di sala 1605'an de bûye ku wê wextê Şahê Faris dixwaze Xanê Mukriyanê Çengzêrî û mîrîtiya wî bike bin nîrê xwe. Ev efsane li ser qehremaniya jin û mîrên mîrîtiyê disekine ku wan serê xwe ji dijmin re xwar nekirine û heta dilopa dawî ya xwîna xwe li dijî dijmin şer kirine.

Bi kurtî naveroka "Dimdim" ev e. ...Wexta Şahê Faris dibîne ku, Xanê Çengzêrî kela xwe ya Dimdimê xweş parastîye, çavtirsandina wî bê feyde ye, Şah ferman dide wezîrê xwe, da ku

ordiyekê bicivîne û wan bişîne hember Xanê Kurd ku 7 sal e serî hildaye. Leşkerên Faris xivetên çadirên(konên) xwe li nêzî Kela Dimdimê datînin. Xanê Çengzêrî wexta wan dibîne, bê ku deqîqekê wenda bike bi dijmin re dikeve şer. Li pey wî jî lawên wî êrişî dijmin dikin. Di cengê de leşkerên dijmin li ber şûrê wan ên tûj li erdê dirêj dibin. Xan di cengê de bêhempa ye. Wexta ew şûrê xwe li alî rastê dizivirîne 12 kesên dixê erdê û li alî çepê dixê 12'ê din dixê erdê. Di roja yek û duduyên cengê de Şahê Faris nikare zora Xan û lawên wî bibe. Ne tenê di du rojên pêşîn de, piştî 7 salên din jî



Xanê Kurd teslim nabe û qeweta wî di ser quweta Faris re ye.

Di 7 salên vê cengê de kewarên zexîrê tijî dimînin. Tenê yek ji wan kewaran vala dibe. Ardê(aranê) vê kewara ku vala maye di qulikên kelê re bera xwarê didin. Wexta mirovek feqîr vî arvanî jî erdê berev dike, Şahê Faris wî dibîne û jê dipirse: -Te ev arvan jî ku derê aniye? Mîrikê feqîr bersîv dide û dibêje: -Ev arvan jî binê kewarek vala berdane jêr, lê belê 6 kewar hîn tije ne. Ev bersîv Şah dike şikê û ew roja din ferman dide da ku dor li Kela Dimdimê bê girtin. Lê heger ji xaîntiya Marakanî (marakanî yek ji malbata Xan e) nebûna wê Xan zafer bi dest xista. Marakanî jî Şahê Faris re namayekê dişîne û di nama xwe de dinivîsîne ku; heger ew di kampa xwe de coyekê(qanalekê) vekin, kela dijmin wê bikeve ber avê û hemû xelkên kelê wê di avê de bicemidin. Wî bi xaîntiya bi welatê xwe re, dixwest ku ji alî Şah ve bê xelatîkirin. Li ser vêya Şah jî Marakanî dipirse: -Gelo te çima bi Xan re xaîntî kir, çima tu jê ne kêfxweş î? Marakanî di bersîva xwe de dibêje ku: "Tenê min başîti ji Xan dîtiye, maaşê min pirr bû, heta merte-ba min ji yên lawê Xan jî bilindtir

bû, lê belê Xan şevêkê nanê zuwa da min". Şah li ser vî tiştî ferman dide ku xaîn ji ber nankoriya xwe bê kuştin.

Wexta Xanê Çengzêrî dibîne ku av dikeve kela wî, ancax baran dibare fahm dike ku di wî îşî de xaîntiyek çêbûye. Ew berê avê vedigerîne ser kela kevn û kela xwe bi qûmê diparêze.

Ceng ji nuh ve destpêdike. Xan û lawên wî kuştinek wisa didin eskerên Şah, êrişek wisa didin ser wan wek ku mî ji destê gurê birçî bikin barrîn. Îcar Şah di coyê re avê berdide

ser kela Xan ku ciyê zexîra wî tîde ye. Wexta Xan vê felaketê dibîne, ew namayekê ji gelê Kurdistan re dişîne da ku alîkariya wî bikin. Feodalên Kurd yek ji wan jî leşkerên xwe naşînin alî Mîrîtiya Mukrî. Û Çengzêrî jî nuh ve dikeve cengê. Êvarê Şah jî Çengzêrî lava dike ku herdu alî jî îstirhet bikin. Îcar wexta şer dişa dest pê dike li alî Mukrî, Kurd jî şer dikin ku hatibûn alîkariya wan. Ew hemû jî qasî Mukriyan mîrxas û qehreman in. Û heta nivê şevê ceng xelas nabe.

Şah fahm dike ku bi qewet nikare zora Kurdan bibe. Îcar dixwaze bi fena şer qezenc ke. Ew dermanê jehrê hazir dike û li meydana şer direşîne. Roja din wexta Xan û lawên wî bi leşkerên xwe re derdikevin qada şer, Şah agir bi meydana dixe û ewana bi saxî dişewitîne. Wexta jin û bûkên Xan vê rewşê dibînin û ji ber ku bi saxî nekevin destê neyar û navê jina Kurd pîs nekin ew jî xwe davêjin nava agir.

Di şerê netewî û rizgarbûna gelê Kurd de efsana "Dimdim" sembolek jîndar e.

Wergêr Lewend Fîrat

Stiriyên me

Lawikê Berrîvanî

Pere Pere pere...

Di navbera 13 û 15'ê meha Çileyê Paşîn de Federyona Komelên Kurdistanê li Stockholmê li ser problemên Kurdên li Ewropayê konferansêk çêkir. Ji 8 welatên Ewropa Rojava gelek kes, komel û rêxistinên Kurd beşdarî konferansê bûn; sê rojan li ser hin problemên Kurdên li Ewropayê peyivîn, ji bo yekîtiyek hîn xurt û hîn firehtir dîtînen xwe gotin. Serokê Enstîtuya Kurd Kendal Nezan jî nûnerê konferansê bû. Li ser perçebûn û hevkarîya rêxistinên li dervayî welat hin dîtînen wî bala min kişand.

Yek, wî jî wek hin kesan, ji pîrrianiya komel, kovar, û rojnamên Kurdî gazin kir û sebebê vê pîrranî û belavbûnê di bin sê nuxtan de top kir:

1- "Siyasî.

2- Kulturî.

3- Li hin welatan îmkân peyde bûne, Her wekî helaw erzan bûye. Van îmkânên malî rê didin ku komele ji hev belav bin û bi serê xwe tiştan bikin."

Mesela siyasî û kulturî hela cardin rê tê heye, lê fikrê erzaniya "helawê" jî min re dîtinek înteressant hat. Bi raya min heger îro li hin welatan "helaw" çêdibe ev ne ji ber erzaniya malzemê "helawê" ye. Û ji xwe marîfeta mezin jî ewe ku di şertê tune de meriv bikaribe malzeme temîn bike û "helawek" baş çêke. Ez baş dizanim çaxa federyasyonê dest bi çêkirina "helawê" kir, bira erzaniya malzeme li wir be, kuçikek û beroşek wan a "helawê" tê de çêkin jî tunebû. Yanî navika xwe bi xwe birrîn...

Kendal Nezan di warê hevkarîya komelên Kurdan de dîtî û pêşniyarên nuh anî. Got ku:

- Heta em mesela malî hel nekin em çendîn car li ser kaxetê komelan deynin, enstîtuyan û aqademîyan deynin, piştî mudetêkê emê herin werin li vê astengê asê bibin. Yanî heta potansiyelek me ya ekonomîk peyda nebe ev karê me her wê bilukume.

Wek tê dîtî; berê bendên li pêş hevkarîyê "siyasî", "kulturî" û "erzaniya helawê" bû, lê nuha problem guherî, ji bo çêkirina "helawê" dibê malzeme, yanî pere hebe.

Berî konferansê dihat gotin ku hêzên Kurd di îdeolojiyê de Ortodoks û di siyasetê de jî pirr îşk in, dibê hinekî xwe "nerm" bikin. Organîzasyonên Kurdan, êdî bi xwe guh dan vê şîretê û xwe guherandin, yan bayê perestroykayê bi ser serê wan jî ket û xwe "nerm" kirin ez nizanim, lê di Konferansa Stockholmê de ev "nermbûn" hat dîtî. Lê çi heyf ku hesabê mal û bajêr li hev derneket, K. Nezan şertekî wisa anî ku rêxistinên Kurd rojê carê xwe nerm(biborin, xwe nuh) bikin jî cardin mesele hel nabe, dibê pere hebe. Û ji xwe ew jî li ba Kurdan tune ye.

Rast e, pere di her demê de wasiteyek muhîm û tim rolekî mezin listiye. Ji ber vê yekê jî gelek kesên meşhûr li ser pera gelek tiştên ji hev cuda gotine. Mesela Shakespare (Şekspîr) gotiye:

- Pere ji pêş dihere, her riyê jî meriv re vedike.

Choderlas de Laclos gotiye: pere, gelek caran riyê xirab jî bi ber meriv dixê.

Thomas More gotiye: pere koleyekî baş, efendiyekekî xerab e.

Dostoyewskî gotiye: pere, wasitayek mezin a îxfalê ye.

Û Napolyon jî gotiye: pere, pere, pere.

Wek xuyaye, di derheqê pera de yekîtiyek tune ye. Lê bi dîtina min serokê enstîtuya Kurd Kendal Nezan bêtir guh dide şîreta Napolyon.

K. Nezan di mesela pera de hîn jî pêş de diçe:

- Pere tunebe pêşvebirina demokrasîyê jî gelekî zahmet e.

Bêguman ev jî dîtinek e. Lê heger hertim wisa ba, nuha Riyad wê kela(merkeza) demokrasîyê ba!

Heger hevkarî û demokrasîya me li ser pera bîmîne me havil kir, em kortika hustîyê xwe dibînin lê wê rojê nabînin...

Lêkolîn

Çend gotin li ser rewşenbîriya netewî û problemên wê

J. Silav

Di van salên dawîn de di jiyana rewşenbîriya Kurdî de guhertinên berbiçav tên dîtin. Yek ji wan guhertinan jî bixwehesîna rewşenbîrê Kurd e. Ew ji do bêtir nêzikî xwe, nêzikî rastî û civata xwe dike, her çiqas ji wan hejmarek pirr mezin bi mekan ji welatê xwe dûr ketibe jî.

Di yardeyên vê "vegerandinê" pirr in. Weka; bikaranîna zimanê Kurdî, mijûldariya bi dîrokê, çand, wêje, jiyana civakî bi psîkolojiya Kurdî û hwd.

Jiyana civata Kurd her çiqas, jiyana bav û kalan, jiyana sedsalan jî be, rewşenbîrê Kurd, îro dîsa ji nuh ve bi çêbûna xwe re di keftelê de ye. Jiyana rewşenbîriya Kurdî ber bi guhertinên baş û erênî de ye. Guhertin bi xwe re pirs-girêk û îhtîmala nû tîne. Nuhîti jî her gav ji aliyê her kesî zû bi zû, bi hêsanî nayê qebûl kirin. Nuhîti jî bo me Kurdan hîn diwar-tir û zahmet tê. Ji ber ku, jiyana me jiyaneke tradîsiyonalî, kevneşopî ye. Vatiniyên me gelemperkirina wê prosesa guhartinê ne.

Di çapemeniya Kurdî de bi nivîsar û meqalan, pirs û pirs-girêkên rewşenbîriya Kurdî yê cur be cur tên munaqeshekirin. Diyar-kirina dîtin û gazinên me bi awayekî din îşareta gihanek nû ye.

Dema babeta me kurtebahsek li ser rewşenbîriya netewî û li ser problemên wê be, divê mirov bi rengekî ilmî civata Kurd, peywendiyên wê, guhertinên ku di nav wê de çêbûne û çêdibin, bibîne. Ew, bingeha analîzên realist û ya tîgîhîştina baştirîn e. Rewşa rewşenbîriya Kurd neynika civatê ye. Ew ji civata xwe, ji peywendiyên civata xwe nayê cihêkirin. Hevîrê rewşenbîrê Kurd; bi peywendiyên civakî, nîrxên tradîsiyonalî, psîkolojî û derûdora wî ya sosyalî tîgîstirandin.

Erê, civata Kurd civateke tradîsiyonalî ye. Peywendiyên civakî, awayê hizirkirinê, awayê jiyanê û hwd. ji aliyê struktûra sosyo-ekonomîk, ji aliyê nîrxên civakî, normên sosyalî, sistema bawerî û dînî(olî) tên tespît kirin.

Di jiyana eşîrên Kurdan de, urf û adet; qeyd û bend, dîwar û kelepçeyên ferdên eşîrê ne. Tesîr û rola van nîrxên tradîsiyonalî ewqas mezin in ku ferdên eşîrê di gelek warî de dişîbin hev. Yanî, jiyana wan ji aliyê van nîrxan ve hatiye standardîzekirinê, hatiye sterilîze kirinê. Serok eşîr, şêx, risîpî û mezinên eşîrê otorîteyên tabî yê organîzekirina jiyana eşîra ne. Hizirkirin û tevgerdanîna serbest ne mumkun e, ew li der-vayî qanûnên tabî yê eşîrê ne, rola raya giştî pirr bi quwet û bi

tesîr e. (Di gund û jiyana eşîrî ya Kurdan de serpêhatiyên herî enteresant û seyr li ser "hesûd", "fesad", "gelaca ne"). Ew peywendiyên tradîsiyonalî îhtîmala hizirkirina serbest ji ortê radike. Rola şexsiyetê dike. Şexsiyeta ferdên eşîrê yan gund, di nav van peywendiyên de çêdibin. Şexsiyet, ew ferd e ku hatiye sosyalîzekirinê. Ferd ji der û dora civata xwe tecrube û normên sosyalî distîne, hîn dibe. Şexsiyeta mirov di wê merhelê de çêdibe.

Polîtîka asimilasyonê zêdetir di nav bajarên Kurdan de tesîra xwe rê da. Bi burokrasiya leşker-sivîl a dewleta Tirk, bi danûstendinên xwe bi rûniştvanên bajaran ve şewata asimilasyonê xiste nav civata Kurd. Bajari bi koçkirina

Di jiyana eşîrên Kurdan de, urf û adet; qeyd û bend, dîwar û kelepçeyên ferdên eşîrê ne. Tesîr û rola van nîrxên tradîsiyonalî ewqas mezin in ku ferdên eşîrê di gelek warî de dişîbin hev. Yanî, jiyana wan ji aliyê van nîrxan ve hatiye standardîzekirin, hatiye sterilîze kirinê. Serok, eşîr, şêx, risîpî û mezinên eşîrê otorîteyên tabî yê organîzekirina jiyana eşîra ne.

xwe ya ji bo bajarên mezin ên Tirkîyê ne tenê potansiyela fizîkî, çand, hebûn û dewlemendiya xwe ya manewî jî bi xwe ra dibirin. Di wê demê de û bi taybetî ji salên 60'î û vir de proseseke urbanîzasyonê (bajarvanîyê) destpêkir. Gundî bi rengekî pirr bilez û bez koçî bajaran kirin. Ev proses di nav bajarên de nîrxên gundîtiyê belav kir û meriv kare beje ku îro di bajarên Kurdan de nîrxên serdest yê gunda ne. Nîrxên tradîsiyonî yê bajaran bi koçkirina bajarvanên ji bajarên metropolî qelsbûne, kevneşopiyên xwe heya ciyekî wunda kirine.

Rewşenbîriya Kurdî jî ji vê guhertinê nesîbê xwe yê negatîf stendiye. Di civata Kurdî de taybetiyên sosyalîzebûna rewşenbîriya netewî hene. Zeîfbûna întîqala zanîn û tecruba di nava nîfşên rewşenbîriya Kurdî de tesîrek pirr ne baş li ser sosyalîzebûn, rewş û pêşveçûna wê kiriye.

Dîroka pêşveçûna rewşenbîriya Kurd, dîroka veqetandinê ye, bi

gotinek din dîroka, "tekerrûra tekerrûrê ye". Her nîfşên nuh yê rewşenbîriya Kurdî bi dûrketinek ji nîfşên berê çêbûne. Sosyalîzebûna wî ji ber ku her gav di nav çarçewa tradîsiyonalî de pêk nehatiye ew bûye yek ji sedemên bingeînê ji xwe dûrketin û ji xwe biyanîbûna rewşenbîrê Kurd.

Mercên objektîfî û sêbjektîfî mecal nedane ku çêbûn û pêşveçûna rewşenbîriya netewî ya Kurda di proseseke tabî û di kevneşopiyên xwe de be.

Dûrketin ji nîrxên xwe yê tradîsiyonalî, bûye sedema dûrketinê ji rastiya xwe, ji xwe, ji netewa xwe. Ew, qels, bê kombûna zanîn û tecrube û bê kok hiştiye. Di çavkaniyên volantrîstî, şablonî, teqlîdî, kompleksên psîkolojîkî yê xwe de û di kêr û xwe mezin dîtinê û belengazî û perîşaniya bêzanîni de, ev heye. Rewşenbîrê Kurd di her dem û her nîfşek nuh de dema hatiye dinê, ji nuh ve ji "tûnebûnê" destpêkiriye, ji nuh ve "her tiştî wî bi xwe kifş kiriye". Di dîroka rewşenbîrê Kurd de ew hevok pirr rastî me tê û pirr seyr e; "Cara pêşîn di dîroka tevgera netewî ya Kurda de ew tiştî ji aliyê me hate danîn".

Ev pesn û fortê xwe dayin û avakirina herî pêşîn" hîn berde-wam dike. Nîfşên berê; "heyranê kêf û şahiyê bûne". "Tiştêk ji me ra ne hiştine", giş "Şêx, mella, axa, beg, dîndar û hwd. bûne". Ew rewşenbîrê herî jîr û jêhatî ku di ava zemzemê de hatine şûştin, nîfşên nû ne. Nîfşên nuh ew bêkokî û libabûna xwe ya bi vî alî wî alî de, bêtir ji wan di şertên krîzên sosyalî yê wek derbeyên leşkerî, şer, têkçûn, qetliamên mezin û hwd. de tîgîhîştin.

Mebesta me ne ew bû ku em li ser vê meselê bisekinin. Ji aliyê tema me li vir ya muhîm naskirina şertên sosyalîzebûna rewşenbîriya netewî Kurd bû, ne encamên wê ne.

Civata Kurd, pêwîst e em bibê-jin ku di guhertinek radîkal de ne jiyaye. Guhertinek ku dem û dezgehên, tradîsiyon û normên, nîrx û sazûmanên wê bihejîne, hinekan ji wan hilweşîne, tune bike û li gora peywendiyên civakî yê nûjen dem û dezgehên civatê ji nuh ve ava bike.

Di pêvajoya netewebûnê de guhertina herî dîrokî û redîkal dema şiyarbûnê, yanî dema ronesansê ye. Di wê demê de li ser bingeên bişivîn û belavbûna (berfirehbûna) peywendiyên sermayedarî, çêbûna bazarên hundirî, şikestina bendên aboriya girtî ya feodalîzmê, bandûrên xwe dide bi guhertina gelemperî ya peywendiyên civakî-peywendiyên netewî. Di wê demê de xwezanîna(şuûra) netewî rolên pirr mezin û girîng dileyîze ji bo pêşketin û xwe xurtkirina netewe-

yekî. Ew ji weka buyerên civakî di pêvajoya dîrokî, di çarçewa tradîsiyonekê de çêdibe, pêşde diçe. Xwezanîna netewî hema yekcar bi çêbûn û belavbûna peywendiyên sermayedarî ve pêknehatiye. Ew li ser bingeên xwezanîna eşîrî, xwezanîna netewetî pêk tê. Wekî tê zanîn di civaka Kurdan de prosesa netewebûn û pêşketina şuûra netewî demeke pirr dirêj stendiye û di şertên pirr dijwar de ji xwe ra rê peyda kiriye. Di xwe xurtkirina netewî û prosesa belavbûn û gelemperbûna xwezanîna netewî ya Kurdan de, hê pirr pirs-girêk û gelş hene. Dema herî dirêj di warê xwezanîna netewetî de tekabûlê dema pêwendiyên feodalî bûye. Eşîr, êl, konfederasyonên eşîran, mîrîti, begîti û paşati; "Kurd", "Kurdistan" bi sînorên mintîqa, di nav çarçewa nûfûz û hakîmîyetên xwe de dîtin. Lêkolînek zanistî li ser sedemên têkçûna serîhildanên Kurd wê vê rastiyê bide xuyânî-kirin.

Pêwîst e berî her tiştî em sedema objektîfî ya dirêjajotin û der-

Dûrketin ji nîrxên xwe yê tradîsiyonalî, bûye sedema dûrketinê ji rastiya xwe, ji xwe, ji netewa xwe. Ew, qels, bê kombûna zanîn û tecrube û bê kok hiştiye. Di çavkaniyên volantrîstî, şablonî, teqlîdî, kompleksên psîkolojîkî yê xwe de û di kêr û xwe mezin dîtinê û belengazî û perîşaniya bêzanîni de, ev heye.

engmayîna prosesa xwezanîna netewî û netewebûnê bidin diyarkirinê. Prosesa şuûra netewî û netewebûn, di şertên pirr dijwar de, di bin zordarî, kuştin, talan, surgûn, jenosîd, asimilasyon û bi metodên din yê kolonyalîzmê dimeşîya. Perçekirina Kurdistanê, kuştin û nefîkirinên serokan, rewşenbîr û berpirsiyarên tevgera netewa Kurd; ji holê rakirinên roj-name, kovar, pirtûk, rêxistin û komelên netewî û hwd. yê berhem û xebatên çand, wêje, huner, ilim û siyasê, qedexekirina zîman û dîroka Kurdî çendîn ji sebebên objektîf yê wê derengmayîne ne.

Ji vir pê ve em dikarin çend gotinan li ser danûstendinên rewşa rewşenbîriya netewî û prosesa netewebûn û şuûra netewî bêjin.

Di şuûra netewî û netewebûnê de, rewşenbîrî, xwedî rolek pirr muhîm e. Bi gotinek din, prosesa netewebûn an şiyarbûnê, prosesa ronahîbûnê ye. Tîrêjen ronahiya

rewşenbîriya netewî, netewe şiyar dike, bi xwe dihesîne. Neteweyê ku bi xwe nehesiyabe û şuûra netewî ya xwe ya gelemper tunebe, hertim mahkûm e ku bibe leystîk û hedefa xapandin, hîle û entîrikayên hêzên biyanî. Hebûna hejmareke pir zêde ji rewşenbîrê "Kurdan" ji bo mîlet û dewletên biyanî, berberî û konflikta di nav van herdu prosesên de dide xuyânî-kirin.

Çêbûn û pêşveçûna rewşenbîrî dema ne di nav çarçewa xwezanîna netewî de çêdibe, ew tu feydê nade netewe û civata xwe. Ji bo pêşketina civata Kurd, pirr girîng e ku di navbera çêbûn û pêşketina rewşenbîriya netewî û xwezanîna netewî de girêdanên pirr saxlem hebin. Di dîroka netewe û rewşenbîriyê de tu netewe û tu rewşenbîriya netewî tune ye ku gihîştîye kamilî û rewaca xwe bê ku rewşenbîriya netewî can û gihana xwe ji netewê xwe û netewe ji tîrêjen ronahiyê ji rewşenbîrê xwe bistîne. Wekî qelsbûn û paşdemayîna neteweyan bi gelek hawayî girêdayî ye bi rola rewşenbîran ku wek ji wan tê xwestin vatiniyên xwe bi cî anîne yan na, her weha berbi bicîanîna vataniyên rewşenbîrê bi netewe û nîrxên netewê xwe ve.

Ew girêdana diyalektîkî di dema şiyarbûna netewe de çawa îfada xwe distîne?

Dema şiyarbûna netewî, ronesans, dema berhevkerin, nûjenkirin pêşxistina hemû nîrxên netewî ye. Di gelek zîmanan de ma'na, şiyarbûna netewî, ji nuh ve çêbûna netewe ye. Di wê demê de, netewe li hemû hebûn û warên xwe çî di mintîqe, çî di grûbek ji civatê, çî di zarav, devok, çî di dema nêzik û kevnar de, çî ji bawerî û dîn û hwd. xwedî derdikeve. Li gora serdema xwe wan dinirxîne.

Pêşveçûna tevgera rizgariya netewê Kurd bi her awayî girêdayî ye bi pêşveçûn û belavbûna xwezanîna netewî û şiyarbûna netewî. Prosesa netewebûnê, bingeha pêşveçûna tevgera netewî ye. Îro jî, gotinên "Kurd" û "Kurdistan" çî mixabin di bin hakîmîyetên "partî", "zarava", "mezheb" û hwd. de tên dîtin. Ev rewş dide xuyânî-kirin ku hê problemên netewebûnê pirr in. Yekbûna mîlet bi tîgîhîştina ser nîrxên gelemper ya netewî ye. Di civata Kurda de hemû nîrxên heyî, nîrxên ferdên netewa Kurda ne. Pêwîst e mirovekî Kurd, rewşenbîrê Kurd bi wê zanabûnê bê perwerdekirin. Ferqî-xistinên zaravî (Kurmançî-Zazakî-Soranî), mezhebî(Alewî-Sûnî) û hwd., tesîrên pirr xirab li yekbûna mîlet, li prosesa netewebûnê çêdike. Ceribandinên weha di dîroka Kurdî de tu feyde nedane civata

Prof. Dr. Şakirê Xudoyê Mihoyan:

"Heta ku meriv fêm neke ku îro pirsê sereke ya gelê Kurd pirsê azadbûna milî ye, meriv nikare tarîxa Kurdan rast binivîse"

-II-

Armanç: Ji kesên, ku bixwazin li ser tarîxa Kurdan bixebitin re wek tarîxnasekî Kurd çi şîretên te hene?

Ş. Xudo: Tu zanî xwestina min çi ye? Berî her tiştî divê ku tarîx rast bê nivîsin, objektîf bê nivîsin. Car-caran di bin tesîra siyasî û peywendiyên dewletên de pirs wusa tê ortê ku meriv alîkî wê dibîne, aliyê din nabîne. Li kêderê rastî tê windakirin, li wêderê ilm tê kuştin. Tiştê rast eger îro neyê qebûl kirin jî sibê ewê ji xwe re rê veke. Loma jî gerek her tişt rast bê nivîsin. Metodolojiya viya gerek rast bê qebûl kirin. Em bêjin gava ku meriv li ser pirsê Kurdî disekine, divê meriv peywendiyên dewletên ku Kurdistan dagir (îşxal) kirine, bibîne; ta'de û neheqîya ku li Kurdan di-be, bibîne, sebebên serhildanên Kurdan bibîne. Yanî ez dixwazim bêjim ku pirsê Kurdan li her çar perçên Kurdistanê pirsek pirralî ye. Piştî lênihêrîna wan hemû faktoran, meriv dikare cewaba pirsê Kurdî rast bide. Gava ku meriv peywendiyên dewleta Îran û Iraqê nizanibe, li Îranê, li Tirkîyê, li Iraqê, li Sûriyê çi diqewime, meriv nizanibe; dîtînen dewletên sosyalîst û dewletên rojava li ser pirsê Kurdî nizanibe, meriv nikare vê pirsê bi hawakî baş nas bike.

Ya duduyan, divê ku tarîxnas spesîfîka hereketa Kurdî baş bizane. Mesela tiştê ku mesela ji bo gelê Tirk meqbûl e, dikare ji bo Kurdan ne meqbûl be. Pirsek ku ji bo Tirkîyan pirsê yekem e, dikare ji bo Kurdan bibe pirsê duduyan yan jî ya sîsîyan. Yanî gelê Kurd ne diji vî pirsê be jî heqê wî heye ku bêje "îro pirsê min a sereke ne ev e". Heta ku meriv fêm neke ku îro pirsê sereke ya gelê Kurd pirsê azadbûna millî ye, meriv nikare tarîxa Kurdan rast binivîse. Ev bîngeh e.

Armanç: Li Sovyetê, li ser tarîxa Kurdan hin tişt şaş hatine nivîsin û heta van salên dawîn bi wî hawî hatine qebûl kirin. Wek nimûne, serhildanên Kurdan ên li hember dewletên dagirker, bi navê "paşverûti" hatine bi navkirin. Ev fikrên şaş ji ber çi sebebên peyda bûne?

Ş. Xudo: Bi fikra min du sebebên esasî yên van şaşîyan hene. Ya pêşîn ew dewletên, rejîmên ku Kurdan li hember wan serhildabû, wek rejîmên pêşverû hatine qebûl kirin. Lê bi esasî ne wisa bû. Yanî mesela siyasî hebû.

Ya duduyan, şaş fahmkirina metodolojiya Marksîst-Lenînîstiyê ye. Yanî zanayên ku bi rastî Marksîst-Lenînîst bûna şaşiyên wisa nedikirin. Ez tenê meselekê bibêjim, Marksîzm-Lenînîzmê ji Marks heta Lenin pirseke gelek

baş hinkirî û şîrovekirî aniye ortê. Heta zanayên burjuwazî digel ku îdeolojiya Marksîst-Lenînîst qebûl nakin jî vî prensîbê qebûl dikin û didin xebitan-din. Di nava her miletekî de, her civakê de du komên pirsan hene. Yek jê pirsên sosyal in, ya din jî pirsê millî ye. Zanayên rastîn qebûl dikin ku heta ku pirsên azadiya millî safî nebin, pirsên sosyal nikarin bîn têkevin derca pêşîn. Şaşîya zanayên me yên salên 30 û 40'î ev bû. Wana cihêtiya pirsê Kurdan û Tirkîyan, pirsê Kurdan û Ereban cûda nedikirin. Pirsê ku jibo Tirkîyan pirsê yekê bû, ji bo Kurdan pirsê du-duyan bû. Şaşî jî vî yekê tê. Em bêjin Mustafa Kemal jî bo Tirkîyan gelek tiştên nû û baş kirin lê ev tiştên wî yên baş jî bo Kurdan tişt nedan.

Armanç: Yanî tu dixwazî bêji ku ji bo Kurdan ber'eksê wê bû?

Ş. Xudo: Belê, ber'eksê wê bû. Zanayên wê demê ev rastî, ev problem nedîtine.

Meseleyek din jî ev e: Kesên ku ev şaşî kirine, ji % 90'î zêdetirê wan Kurdan nas nebûn. Warê xebat û zanîna wan warekî din bû lê wan di kêlekê de li ser pirsê Kurdan jî hin tişt nivîsîne.

Armanç: Tu dikarî wek nimûne çend navan bibêji?

Zanayên rastîn qebûl dikin ku heta ku pirsên azadiya millî safî nebin, pirsên sosyal nikarin bîn têkevin derca pêşîn. Şaşîya zanayên me yên salên 30 û 40'î ev bû. Wana cihêtiya pirsê Kurdan û Tirkîyan, pirsê Kurdan û Ereban cûda nedikirin. Pirsê ku jibo Tirkîyan pirsê yekê bû, ji bo Kurdan pirsê duduyan bû. Şaşî jî vî yekê tê.

Ş. Xudo: Belê, mesela Gurko Kiryajîn hebû, Pavlovîç hebû, Kurdoxî hebû. Evana û hin kesên din ên wek vana, tiştên şaş nivîsîne. Wan esasê hereketên Kurdan rast û pak fahm nekirine. Nuka ferqiyeta me ev e ku em li ser tarîx û pirsên Kurdan dixebitin û meramê me ev e ku em binêrin ka rastî kîjan e, derew kîjan e? Loma jî ew meqaleyên ku di wan salan de hatine nivîsin jî alî me ve hatine rexnekirin û tene rexnekirin. Em wana red dikin, qebûl nakin.

Armanç: Ji van şaşîyan tu dik-

arî çend nimûne (mîsal) bidî?

Ş. Xudo: Em bibêjin hereketa Şêx Mehmedê Berzencî. Şêx Mehmed li dijî emperyalîzma Îngilîzan şer dikir lê dinivîsandin ku ew casûsê Îngilîzan e. Eva 'ecibeke giran e! Wî bi xwe jî Lenin re name nivîsiye, dibêje em dewleta Sovyetê piştevanê xwe qebûl dikin. Wî bawerîya xwe bi Sovyetê aniye...

Serhildanên Kurdan ên wek ya Şêx Seîd, ya Dêrsîmê, ya Agriyê û yên mayîniş giş wa bûn.

Armanç: Te jî gotibû ku di vî warî de hin şaşî hatin rastkirin. Kê, bi çi hawî rast kirine?

Ş. Xudo: Di nava xebatên min de ev şaşî hatine diyarkirin. Him di kitêba min de him jî di çend meqaleyên min de. Herçiqas navê wan nehatibe gotin jî ew şaşî giş hatine rexnekirin û rastkirin.

Armanç: Bê ku bîne bi navkirin?

Ş. Xudo: Belê, navên wan kêman hene lê meqaleyên min ên taybetî hene ku tê de kê çi gotiye, hatiye nivîsin. Mesela meqaleke min heye li ser "Li Iraqê pirsê Kurdan di nava siyasetê emperyalîzma Îngilîstanê de" ye. Min li wir nîşan daye ku Îngilîzan çawa Kurd û Ereb berra hev dane, çawa Kurd xapandine, heqê wan nedane. Digel viya min behsa wan tarîxnas û nivîskaran kirîye ku ew pirsana şaş fahmkirine, şaş dane fahmkirin.

Wekî din jî hene. Mesela Xalfîn hema bêje bi taybetî li ser van pirsan meqaleyek gelekî hêja nivîsiye. Ev nivîsa Xalfîn di 1967 (yan jî 1968)'an de di kovara Gelên Asya-Afrîqayê de neşir bû. Wekî ku tê zanîn ev, li Sovyetê kovara rojhilatnasiyê ye. Ev meqala Xalfîn meqaleyek lape (pîr) bihagiran e.

Di kitêba Xalfîn de jî çend tişt hene lê ew meqale ya metodolojî ye. Vê bi temamî bersîva pirsê te daye û diyar kirîye ku ew şaşî çima û çawa hatine kirin.

Armanç: Çi tarîxnas çi nivîskarên din, gelek caran meriv di nivîsên xwe yên kevn de kêmanî an şaşîyan dibîne û heta carna tiştên hene ku meriv dibêje "ax, min wê demê çima weha nivîsi?", yan jî "çima min weha ne-nivîsi?" Nivîsên te yên ku tu ji bo wan weha dibêji, hene?

Ş. Xudo: Tu rast dibêji. Ez ne tenê ji bo xwe lê bi hawakî giştî dibêjim: Ew tarîxnasê ku di nivîsên xwe yên kevn de kêmanî nabîne, ew ne tarîxnas e. Ew nivîskarê ku di nivîsên xwe yên kevn de kêmanî nabîne ew êdî qediyaye, xwe xelas kirîye.

Gelek pirs hene ku ger min bi vî zanabûna xwe ya îroyîn binivîsiya, minê bi teherekî din binivîsiya. Ji xwe ilm bi vî yekê pêş de diçe.

Pirsên ku ez îro jî nû ve dinivîsim, ez bi teherekî din dinivîsim. Nuka kitêbeke min li Moskvayê tê çapkirin. Di vî kitêbê de ez li ser mesela Kurdî li Iraqê (ji sed sala 18'an heta nû) disekinim. Tiştên ku min heta nû nivîsîne di vî kitêbê de cih digrin lê hin tiştên ku min berê nivîsîne, ez diguherînim, rast dikim. Tiştên ku nivçe hatine gotin, ez wan temam dikim lê ne bi motîfê siyasî.

Paşê, çetîniyê gelek mezin a din jî ev e: Tarîxnasê ku li ser hereketa Kurdî ya îroyîn dixebite, li hember diwariyê ye. Çimkî prosesa siyasî dest pê kirîye lê gelek pirs hê xelas nebûne û tu nizanî netîceyên wan wê çawa bin. Îro li hev piçikîne, tu nizanî sibê ewê bighên çi pirsê. Paşê, dibe ku pirsê piştî sarbûna qewimandinê, piştî derbazbûna demê hîn zelal bîn fahmkirin. Lê tarîxnas nikare bisekine, sal derbazbin da ku tarîx binivîse. Diwariyêke tarîxnasên dema nû jî ev e. Divê ku ew li ser nivîsên xwe pîr bisekine û diqqet bike.

Ez naxwazim pesnê xwe bidim, hezar carî bibexşîne lê ezê mîsalekê ji xwe bidim. Gava ku di sala 1973'yan de li Iraqê Cepha Wetenî qebûl, min wê demê fikra xwe nivîsi (ew meqala min wê demê çap nebû). Min nivîsbû ku gelek kêmanî di nava hêzên pêşverû de hene. Gelek kesî vîya nedidît. Wan digot ku ew tiştêkî pêşverû ye, gerek giş bikevin nav û hwd. Piştî ku çend sal derbaz bûn, hat fêmkirin ku ya kê rast e, ya kê ne rast e. Ez rûreş derneketim. Yanî ez dixwazim bêjim ji alîkî ve li ser pirsên îroyîn xebat zahmet e, ji alîkî ve jî hêsan e. Çima zahmet e, min got. Hêsan e jî, çimkî enformasyon zahf e; rojname, kovar, radyo, televizyon hwd. hene. Ev keremeke mezin e. Tarîxnasê ku li ser pirsên qedîm kar dike, heta tiştêkî peyda dike çavê wî derdikevin.

Armanç: Kek Şakir, ger tu destûr bidî ezê li ser pirsê Kurdan û politîka Sovyetê tiştêkî bipîrsim. Dibe ku ew pîrs rasterast ne bi warê xebatê te ve girêdayî be lê ez dixwazim bizanîm ka tu çi difikirî?

Tiştêkî pîr vekirî ye ku welatên sosyalîst divê ku ji tegvera proleterîya cîhanê re û ji gelên bindest re alîkar bin. Ji prensîbên Marksîzm-Lenînîzmê yek jî ev e. Vê yekê herkes dibêje. Mesela demek berê di *Svensk-Kurdisk Journal* de fikrên Lazarev jî gotibû ku Sovyet li gor prensîbên Marksîst-Lenînîstî li vî mesele dinihêre û prensîbê enter-nasyonalîzmê jî xwe re bîngeh girtiye. Îcar bi taybetî hin tiştên ku vî dawiyê bûn, mesela di tofana Helebçê de bîdengîya Sovyetê li gor kîjan prensîbên enter-nasyonalîzmê ye?

N HEVPEYVÎN HEVP

Ş. Xudo: Bi fikra min meriv an jî organîzasyon gazinê xwe ji dostên xwe, ji pismamên xwe dike, ne ji dijminê xwe. Ez bi xwe van pirsan gazin hesab dikim û bi fikra min li ser qewimandinên dawîn wek mesela Helepçê û yên din divê hîn zêde bihata nivîsîn. Bi a min ev kêmaniyek bû. Divê hîn bihata gotin. Çimkî pareke zêde ya hereketa Kurdî pêş-kevtî ye, progresîv e. Serokên Kurdan, şervanên Kurdan, Sovyetê piştevan û pismamê xwe dihesibînin loma jî gazinan dikin û pismam divê ku guh bide gazinên pismamê xwe.

Armanc: *Di vî warî de zanayên din, kesên din, çi yên li Ermenîstanê çi li Sovyetê bi giştî, rexneyên xwe îfade kirine gelo?*

Ş. Xudo: Dibêjin, dibêjin...

meselê hebe, bona Helepçê bêdeng bimîne an tiştên şaş bibêje.

Divê em ji bîr nekin ku salên derbazbûyî, Hukûmeta Sovyetê ne tenê bi gotin û nivîsîn lê bi dereca hukûmetê jî piştigirîya hereketa Kurdî kiriye. Ez di meqaleyeke xwe de li ser vê yekê sekinîme. Mesela di salên 1960'î de Tifaqa Sovyetiyê jî hemû dewletan bêtir piştigirîya Kurdan kiriye.

Armanc: *Vê dawiyê meqaleyeke Hesretyan di rojnama Îzvestiya de derketibû. Li wir behsa van qewimandinên dawî nekirîye.*

Ş. Xudo: Na, behsa vê pirsê hatiye kirin. Min bi xwe li ser trajediya Helebçê meqaleyek nivîsiye. Eviya di rojnama Riya Teze de çap bûye, ezê ji te re bişînim.


in lê li Azerbaycanê Kurd pirr in. Lê nuka dibêjin tunene.

Armanc: *Kurd çima bêdeng dimînin?*

Ş. Xudo: Kurdan jî pirs danîne da ku li ser pirsê wan jî bête sekinîn. Ez bawer im wê lê bête nihêrtin. Pirsê extiyariya Kurdan jî wê lê bête hûrbûnê.

Armanc: *Gilî û daxwazên Kurdên Azerbaycanê çi ne?*

Ş. Xudo: Kurd dibêjin gerek mektebên me hebin, gerek em bi zimanê xwe xebêrin, bixwînin, bira radyoya me hebe, rojname hebe. Çawa ku li Ermenîstanê û li Gurcîstanê heye. Yanî Kurd dibêjin em li gor qanûnên Sovyetî heqên xwe dixwazin. Li Sovyetê pirsê millî bi giştî hatiye safikirin lê pirsên piçûk hene. Ji kêmaniyên yek jî ev e.



Prof. Dr. Şakirê Xudo bi hozan Şivan û Gulîstan re

(Foto: Armanc)

Armanc: *Mesela?*

Ş. Xudo: Mesela van axiriyan komentatorê (yorumcu) navdar Aleksandr Bovîn, di televîzyona Sovyetê de li ser trajediya Kurdan pirr baş xeber da û hinek rexne jî kir. Ez bawer dikim ku ewê li ser vê pirsê hîn bête nivîsandin. Çimkî nuka li welatê Sovyetê demokrasiya rastîn, glasnost û prestroyka heye, em dikarin fikrên xwe bibêjin.

Armanc: *Bêguman dewletek gava ku politîka xwe li ser tiştê tesbît dike, em bêjin gava ku Sovyet politîka xwe li ser pirsê Kurdan tesbît dike, ji hîn tiştan hereket dike. Di tesbîtîkirîna vê politîkayê de, di van şaşî û kêmaniyên de tesîra zanayên Sovyetê tune gelo? Tarîxnas an kesên ku li ser mesela Kurdan enformasyon didin, di van şayîyan de çi rol dilîzin?*

Ş. Xudo: Car-caran kesên ku xwe nizanin an ne şareze ne, enformasyon didin û li ser vê bingehê şaşî tînin kirin. Ez texmîn nakim zanayê ku haya wî ji

Armanc: *Digel viya ev kêmanî heye, tiştên ku tu dibêji ne bes in...*

Ş. Xudo: Kêmanî heye helbet. Ma-dem glasnost e, divê rast bête nivîsîn. Ez li ser wê fikrê me.

Armanc: *Meseleyek aktuel a din mesela Arsax(Qerebax)'ê ye. Ji konfliktên Azerîyan û Ermenîyan, Kurdan jî ta'dehyî û zirar dîtin gelo?*

Ş. Xudo: Ez viya bêmim. Eviya ne dijiya Azerîyan û Ermenîyan e. Eviya şasiya serkariya Azerîyan e. Wan di wa'dê xwe de gelek neheqî li Ermenîyan kirine. Eviya fikra min a şaxsî ye, dibe ku ez şaş bim lê ez wisa difikirim. Bi fikra min cim'eta Arsaxê yanî Qerebaxê, Ermenî ye. Heqê wan heye ku bêjin "em dixwazin tevî civata xwe bibin". Loma jî em Kurd di vê pirsê de piştigirîya Ermenîyan dikin.

Armanc: *Li wê derê Kurd jî hene?*

Ş. Xudo: Li Arsaxê bi xwe Kurd kêman

Armanc: *Tu vê rewşê çawa îzeh dikî?*

Ş. Xudo: Eviya şasiyeke mezin e. Ne Marksîstî ye ne jî Sovyetî ye.

Armanc: *Bi fikra te glasnost û prestroyka wê li ser Kurdên Sovyetê çi tesîra pozîtîf an jî negatîf bikin?*

Ş. Xudo: Bi texmîna min ewê tesîrek pozîtîf bikin. Kurdên Sovyetê û hemû gelên Sovyetê gelek qîmet didin prestroyka û glasnostê. Çimkî berî her tiştî di nav demokrasîyê de bi hawakî azadane em dikarin fikra xwe bibêjin. Ev bona gişan e, bo me Kurdan e jî. A duduyan, nuka pirs danîne ku ji Res-pûblîkayên Sovyetî li ciyên ku Kurd lê dijîn, extiyariya wan hîn zêde bikin. Der-sên wan zêde bikin, hîn zêde kitêban çap bikin, heqê di radyoyê de xebêrda-nê bidin. Mesela nuka serkariya hukûmeta Qazaxîstanê mexsûs meriv şandine Ermenîstanê da ku ji bona zar-okên Kurdên li Qazaxîstanê kitêbên dersan çap bikin. Nuka ji bo Kurdan ge-lek tişt tînin kirin.

Armanc: *Kurd bi xwe çi dipên, çi dixwazin? Bi hawakî sistematîk, bi program daxwazên xwe îfade kirine yan na? Ne wek şexsê lê wek civaka Kurd li Sovyetê, wê ev tişt kirîye?*

Ş. Xudo: Bi qasî ku ez dizanim programêk taybetî bona temamiya Kurdên Sovyetê tune.

Merem û armanca Kurdên Sovyetê ev e: Qedr û hurmeta extiyariya wan bête zanîn, muzîk û reqasên wan bika-ribin hîn zêde îmkanan bi dest xîna da ku muzîka wan pêş de here, bi Kurdî heqê xwendinê hebe, kitêbên Kurdî hîn zêde bêne çapkirin...Ev pirs îro tînin ortê. Xên ji vê yekê, nuka pirs tînin da-nîn da ku wekilê cim'eta Kurdan di nava serkariyê de hîn zêde ciyê xwe bigrin.

Armanc: *Bi qasî ku em dizanin heqên Kurdan li hemû Komarên Sovyetê de ne wek hev in. Se-bebê viya çi ye?*

Ş. Xudo: Li Gurcîstanê gelek xebat tînin kirin, gelek tişt hatiye kirin. Derheqê Azerbaycanê de gava berê min hîn tişt gotibûn. Li Qazaxîstanê û Tacîkîstanê jî nuka ev pirs tînin dayîn. Yanî ber bi pa-kiyê xebat tînin kirin.

Heta nuha xebat sist bûye, yan jî ge-lekî kêmanî tînde hebûye. Ew tiştê ku nuka dibe, berê nikaribû bibûya. Nuka ev siyaseta nû bûye keremeke mezin. Kurd jî dikarin derdên xwe bibêjin.

Armanc: *Ez gelek sipas dikim. Ji xeynî pirsên me tiştêkî din ê ku tu bixwazî ji xwendevanan re bêjî hebe, fermoyê?*

Ş. Xudo: Ez bi xwe rojnama we Ar-manc dixwînim. Ez vê xebata we ji ber du sebebên gelekî begem dikim. A ye-kem, Armanc bi hawakî objektîf xebê-ran dide. A duduyan, bi Kurdî ye.

Pirseke din, xwestina min e ji Arman-cê. Dijîti ne tenê di nava Kurdan de heye, çi heyf ku di nava kovar û roj-na-mên Kurdî de jî car-caran heye. Ez texmîn dikim ku êdî em giş ji viya têr bûne. Werin em giranî bidin ser tiştên ku me dighînin hev, ne yên ku me ji hev dûr dixin. Gelek sipas.

Çîrok

Hevalno, îro di rojeva me de sê nuxte hene. Ya pêşin roja Şemiyê berevkirina kakivilka (kuvarka)-ye. Ya duduyan şayîya ji bo teqawutbûna xedeme ye, û ya sîsiyan ji Perestroyka ye. Hevalno, nuha hinekî aktif bin. Em van pîrsana çuqasî zû biqedîn, emê karibin hewqasî zûtir herin malê. Belê, wek min got, roja şemiyê emê herin kakivilkan?

- Erê!
- Nuxta yekem bi vî hawî derbas bû. Wê wextê em derbasî nuxta duduyan dibin. Ez pêşniyar dikim ku em her yek rublekî bidin û ji xedeme re diyariyakê bikin. Giş bi vê pêşniyarîyê re ne?

- Erê!
- Wê çaxê em derbasî nuxta sîsiyan dibin û min dixwest ku wisa bipîrsim: a nuha li welatê me çi dibe, hevalno?

- Ma çi dibe, çiyê?
- Çi bûye?
- Ma nuha cardin tişteki din bûye?

- Li ku? Kînga?
- Tiştê ku nuha li welatê me dibe, tê kirin, çiyê? Tu çi dibê Ivanov?

- A nuha havîn e!
- Bê şik ez ji pîr baş dizanim ku havîn e! Lê di qada SOSYAL de li welatê çi dibe? Petrov!

- Bê guman qey komunîzm neke-tiye jîyanê!

- Çi alaqa komunîzmê bi vê heye! Tiştê pêşverû çiyê ku nuha dibe, di hereketê de ye? Sîdarov

- Tiştê pêşverû û pêşketî derdikeve pêş û yê kevn û rîzyayî ji paş de dihere. Em nuha giş li vir kom bûne û ew deqîqe ji pîr ne dîr e, kînge ku...

- Bese şihîra bibire! Navê wê PERESTROYKA ye! Li welatê perestroyka heye!

CIVÎN

Lion İzmalov

- Erê ne tişteki nuh e. Me digot qey tişteki nuh e. Eşkere ye ku em perestroykayê nas dikin.

- Erê tamam. Lê tu ji hinekî xwe bide serhev û bi me re be. Îşev di telewîzyonê de beşê 13' an yê "Dergehê Gunehkariyê" dilîze.

Pêşniyara te çi ye Îvanov?
- Pêşniyara çi? Hewce be ji xwe hewce ye.

- Bi tevayî, erê. Lê belê ku em karibin hinekî konkrettir bigrin. Tu dibê em çi bikin? Sîdarov!

- Bi rastî pîrsek hêjayî fikirandî-nê ye.

- Çima tu berê nefikiri?
- Berê ez li kakivilkan fikirim, dîre li xedeme, dîre li gunehkariyê û dîre ji li dergeh.

- Wê çaxê baş e. Petrov, tu çi dibê? Li ser perestroykayê fikra te çi ye?

- Yanî, wek pîrensîp tişteki min li dijî tune ye.

- Brawo! We bihist tişteki wî li dijî tune ye! Hemuyê welatê li gel e" û nuha Petrov ji tenezul dike ku ew ji xwe pê ve girêde. Di derheqê vê yekê de tu çi dibê, Marja Stepanov-na?

- Ez, ji alî min de min tu carî ji vî Petrovî hez nekîr. Payizê 10 ruble ji min deyn kir û ez difikirim wê xwe hinekî nêzik min bike, lê belê ji dêlî vê ve, tew li min vegerandî-na perê min ji jî bin de di ser guhê xwe re avêt.

- Baş e, hevalno! Wê çaxê em wisa

dibên: em çawa dixwazin? Emê dom bikin wek berê bijîn, yanî pasîf, ya ji di avakirinê de emê aktiftir bin, xwedî însiyatîf bin? Çima hûn giş bê deng rûniştine? Nêta te çi ye Petrov? Ma tu dixwazi dîzanek nuh bîdî jîyana xwe?

- Eger ez meaşekî bilindtir bistînim, wê wextê...

- Dibê berê tu bixebitî, ku dîre meaşê te zêde bibe!

Ma tu dibê çi Îvanov? Nêta heye ku tu dîzanek nuh bîdî jîyana xwe?

- Yanî Petrovê meaşekî zêde bistîne û ezê ji jîyana xwe tîkim dîzanê!

- Ero Sîdarov? Ma rast e ku ji bo te bes pere muhîm e?

- Na, bê guman gelek muhîm e ku meriv jîyana xwe ji tîxe dîzanê.

Baş e Sîdarov! Wê çaxê dibê meriv çer bike ji bo ku bi hawakî nuh jîyana xwe tîxe dîzanê, ji bo ku baştir bijî, divê meriv çi bike?

- Dibê meriv meaş zêde bike.

- Tu dîsa çû ser wê meselê! De ka tu tişteki bibêje Marja Stepanov-na! Ma bi rastî tu naxwazi ku hîn baştir bibe?

- Ma kî naxwaze? Û jê pêştir tu tişteki min ji tune ye!

Baş e. Herkes dixwaze ku baştir be. Lê ji bo ku baştir bibe dibê em ji şêla xwe biguherînin. Maneya şêl-guherandî û prestroykayê çi ye? Wek numûne gava her tişt zû zû tê

kirin, wek çirisk vejene. Navê wê çiyê, lo Îvanov?

- Stres.
- Ne stres. Suratek bi hêl! Wexta gel ji rutbe û meqam şayîşê nake (hesab nake) her kes dîtînen xwe (çi difikirin) raste rast û eşkere dibê-jîn, navê wê çiyê?

- Belkî bê rûti, bê terbiyetî ye.

- Na na glasnost e. Û meriv jê re dibê çî, gava ku meriv pêşniyara tîne, tiştê nuh dibêje û bîyî ku jê bî pîrsîn xwe tevî tiştê dike, navê wê çi ye? Îvanov?

- Rûşuştî ye.

- Na, mana wê însiyatîfa avakar e. Nuha ji dixwazim bîzanîbim ku hûn dikarin li ser van her sê tiştan çi bikin? Îvanov tu dikari çi bîdî welat?

- Xwînê.

- Xwedê bela xwe bide te, kî muhtacî xwîna te ye law, wê xwîna te ya bî yom a serxweşa! Lê tu Petrov?

- Em bîjin ezê di wextê de werim karê xwe.

- Lê tu Sîdarov?

- Ezê xwîna xwe bibexîşînim û di wextê de werim kar.

- Lê tu Marja Stepanovna, ma tu yê ji xwîna xwe bîdî?

- Çima hema xwîn? Ez dikarim tahlîlên din bidim!

- Baş e hevalno! Îro bes e! Sibê di wextê de werim kar. Di navbera 9 û 11'an de emê li ser prestroyka bî-sekinin.

**Ji Kovara Nyheter
Fron Sovyet Unîonen
Nr. 12.1988
Wergera ji Swêdî;
Zinarê Xamo**

ilim û teknîk

Gelo wucûdê mirovan germiya xwe çawa diparêze?

Germiya wucûdê mirov ji alî beşekî mejiyê mirov tî eyarkirin. Navê vî beşê mejiyê mirov hupotalamus e. Ew, wek termostatê 37 derece eyarkirî kar dike û ev germiya ha herî baş e ji bo hemû guhertinên kimyayî ku di laşê mirov de pêk tînin.

Dema germiya xwînê dikevin binê 37 derecan, mekanîzmên hupotalamus dest pê dikin û germiya xwînê zêde dikin.

Dema gera xwîna mirov di bin çermê mirov de wek adetî neherike, germiya laşê mirov kêmtir dibe. Lê dema mirov xwe dilivîne (hereket dike) gera xwînê bi leztir dibe û germî jî bi vî awayî zêde dibe. Helbet tenê germiya laşê mirov zêde nabe, hîn hormon jî bi xwe re dide. Germiya laşê mirov ji ûrê dawî tî pîvandî. Ev der ciyê merkzî yê germiya laşê mirov e û hupotalamus tim û tim xwe li gor vî derê rast dike.

Li gor rewşa derûdora mirov germiya li çermê mirov û bi taybetî li mil û lingên mirov pîrî tî guhertin. Eger li derve germiya hewê 30 derece be, germiya çermê mirov dibe 34 derece.

Çermê mirov organek hîskirî-nê ye. Mirov çiqas germiyê dîde der girêdayî ferqa germiya hewayê û laşê mirov û xwêdana ku dibe buxar, e. Windabûna germî li gor qanûnên fîzîkê pêk tî.

Dema germiya hewê li dor 30 derece be windabûna germî hindîk dibe û germiya ku mirov di istirehetê de kom dike (çêdike) tîrî germiya esasî ya 37 derece dike.

Ne hewce ye ku mekanîzmên ku germiya kêmtir dike yan jî zêde dike xwe bilivînin û ji ber vî yekê mirov nacemide ji.

Eger germiya hewayê 37 derece an jî zêdetir bibe wê çaxê laşê mirov bi rehetî ji germiya zêde xilas nabe û bervajîya vî, germiya laşê mirov zêde dibe.

Di rewşeke wiha de ji bo kêmkirina germiyê çareyek tenê heye, ew jî xwêdandan e. Lê di rewşeke wiha de divê mirov bala xwe bide ku xwêdandayîn nebe sebebên nexweşî-nê.

**Ji "Illustrerad Vetenskap"
Hejmar 3, sal 1988**

Hindik-Rindik

Zinarê Xamo

Haziriya Herbê

Di filmekî telewîzyonê de lawik dît ku kesên îndian wecê xwe boyax dikin. Vê yekê bala lawik kişand, ji bavê xwe pîrsî:

-Bavo, vana çima wa dikin?

- Haziriya herbê dikin, lawê min.

Roja din gava lawik dît ku waye diya wî makyajê dike, tevilê bazda ba bavê xwe, got:

- Bavo, rewş gelek xerab e. Li hundur diya min haziriya herbê dike!

Masî

Di raxistina Pablo Picasso de camêrekî ji temaşa risman zêdetir bi navê wan ve mijûl dibû. Li ber rîsmê bi navê "masî" sekinî, piştî ku dirêj dirêj li risim nerî, ji yê kêleka xwe re got:

- Ma kudera vî masî ye?

Vê gavê Picasso ji kêlek wan derbas dibû, bi nezaket got:

- Ew ne masî ye

- Ê heger ne masî ye, lê çiyê?

- Risim e!

Meraq

Marja piçûk ji diya xwe pîrsî:
-Dayê, ma hemû tiştên ku dibin, Xwedê dibîne?

- Erê, dibîne keça min.

- Her tiştê tî gotin jî dibihîze?

- Erê, dibihîze keça min

- Hemû tiştên zarok dikin û dibêjin jî?

- Erê keça min, wan jî dibîne û dibihîze

Marja piştî ku bi çend saniyan fikirî, got:

- Ha ho ew jî çiqas meraqçî ye!...

Lolo

Sûcê mîrik giran bû, wê muheqeq ceza bixwara. Awûqatê wî jê re got: "Ezê te xelas bikim, lê wê heqê min jî hinekî zêde be"

Li ser heq li hev kirin, awûqat got: nuha baş li min guhdarî bike:

-Mêze, hakim çi dibêje bira bibêje, çi dipirse bira pipirse, tuyê tim bibê "lo lo"

Di mahkemê de hakim pîrsî:

- Navê te çi ye?

- Lo lo

- Ez ji te navê te dipîrsim, bersîva min bide!

- Lo lo

- Tu çend salî yî?

- Lo lo

- Lawo ez ji te re dibêjim vira mahkeme ye, bersîva min bide!

- Lo lo

Awûqat hêzî ser xwe kir:

- Hakim beg, wek hûn jî dibînin muwekilê min dînekî bî zirar e, qet tişteki fahm nake. Ji ber vî yekê jî mesûliyeta wî ya cezayê tune ye, dibê bî berdan.

Dawîya dawî, hakim jî gihîşt wê qenaetê û biryarek li gor daxwaza awûqat da.

Roja piştî mahkemê awûqat ji muwekilê xwe heqê xwe xwest. Lê mîrik xamiya xwe ya mahkemê li ba awûqat jî da domandin, her got:

-Lo lo

Awûqat got:

- Dosto, vira ne mahkeme ye, were ser hişê xwe û dev ji henekan jî berde!

- Lo lo.

Tepelika serê awûqetê avêt, got:

- Bala xwe bide min, ez ji te pera dixwazim beg efendî! Ma ji me re jî lo lo?

Ne karê aqila ye lê rast e

Amadekir: Hesen Mizgîn

Di bin çemê Nilê re(di bin erdê de) çemekî din diherike ku ava wî jî Nilê 6 car zêdetir e.

Li dinyayê ji heywanên (sûrûngen) herî mezin tîmseha Pencabê ye û li rojhilata başûrê Asyayê dijî. Giraniya wê digihîye heya 2 tonan.

Du şirketên Brîtanî niha li ser datayeke (komputer) super dixebitin. Ev data wê bikaribe di saniyekê de qasî 250-350 milyon aghdari bide. Buhayê wê datayê 2,5 milyon kronê Swêdî (nêzî 400 hezar dolar) ye.

Li dinê dara herî bi emîrtir (5100 salî), di Nisana sala 1988'an de hat birrîn. Dar, awayek jî dara çamê bû û li Sîyera Nevada ye bû.

Mejiyê miroveki nêzî 1424 giram e. Piştî 55 salî giraniya mejiyê mirov kêmtir dibe û dibe nêzî 1395 gram.

Li dinê nêzî 30000 nexweşin hene, lê ji van nexweşinan dermanê nêzî 10000 nexweşinan hene. Di piraniya nexweşiyên dermanên ku tên bi karanîna nexweşinê rehet nakin, lê tenê êşa mirov kêmtir dikin

Li Fransayê jî bo kesên seqet atomobileke nû çekirine. Mirov bi dengê xwe dikare lambên çep û rastê, camşoyê bide xebitandin. Otomobîl bi xarekê (gulle) tê idarekirin û pedala gazê jî bi destê teyarkirin.

Jinên ku li herêmên çiya dijîn jî jinên ku li ber derya dijîn biçûktir zarok tinin. Sedema wê yekê di herêmên çiya de kêmbûna oksîjenê ye.

Lêkolînerên Brîtanî hêvî dikin ku heya sala 2000'an wê bikaribin gerreka (cirkulation) ava deryayê hesab bikin. Piştî re jî wê bikaribin rewşa hewayê ya 10 salên pêşde bibêjin.

Prof. M. Hasretyan:

"Serîhildanên Kurdan milî bûn"

Serokê Beşa Kurdî ya Moskova a Akademiya Zanistîya Rojhilat Prof. Manuel Hasretyan di 29'ê Çileyê Paşin de li Stockholmê li ser xebata Kurdolojiya Sovyetê û bi taybetî jî li ser beşa xwe agahdarî da.

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd ev civîn amede kiribû û nêzî 300 kesî di civînê de hazir bûn.

Prof. Hasretyan di axaftina xwe de got ku van salên dawî li ser pirsê Kurdan xebatên beşên Kurdî yên Sovyetê pêşve çûn û sedemên wî tiştî jî ew in ku guherandin li welatên Sovyetê çêdibin.

Prof. Hasretyan dîr û dirêj li ser

beşa Kurdîya Moskovayê sekinî û ferqa xebatên wê û xebatên beşên Kurdî yên Lenîngrad, Eriwan û Teblîsê anî zimên. Got, Beşa Kurdî ya Moskovayê li ser pirsên dîrok, civak, aborî, tevgera rizgariya Kurd, pirsên aktûel û hwd. disekine û di wî warî de xebatên ilmî dike.

Prof. Hasretyan piştî axaftina xwe bersîva pirsên guhdaran jî da. Bi taybetî li ser serîhildanên Şêx Seîd, Dêrsim û Agirîyê pirs hatin kirin. Di bersîva wan pirsan de Hasretyan got ku herçiqas sedemên wan serîhildanan û haziriya wan ne wek hev bûne jî lê serîhildan hemû gelerî bûn û ji bo

bi destxistina mefên milî yên Kurdan bûn.

Li ser têkçûna şoreşa Kurdistanê Iraqê û rola Sovyet jî Hasretyan weha got: "Ev tişt hîn, fireh û bi ilmî nehatiye analîzkirin, bi dîtina min di têkçûna şoreşa 1975'an de kêmasiyên Sovyet jî hebûn lê belê ewist e meriv kêmasî û şaşîtiyên şoreşê bide ber çav".

Kêmasiyên îro ku di siyaseta Yekîtiya Sovyet de li ser mesela Kurdan hene li gor Prof. Hasretyan wê di dema Perestroykayê de bêtir safîkirin. Û wê perestroyka îmkân bide ku arşîvên di wî warî de hene bêtir dîtin û li ser dîroka Kurdan tiştên hîn ilmî bêtir kirin.

Li ser "rexne" yên Orhan Kotan*

Sebîha Arjen

Gelo ma 2.5 û 9.5 qasî hev in. Na, na! Bi min nekenin. Li gor Orhan Kotan qasî hev in, ne li gor min.

Bi rastî jî, ku meriv 2.5 û 9.5'an qasî hev bibîne divê êdî xwedê merivan bistrîne. Ev ne îşareta başiyê ye.

O. Kotan di rojname Kurdistan Press, hejmara 49'an de bi munasebeta mîqtara Kurdî û Tirkî weha dibêje: "Bi baweriya min mîqtarên Kurdî û Tirkîya rojname qasî hev in". Lê min di wê hejmarê de rûpelên rojname hejmartin, du rûpel û niv bi Kurdî, neh rûpel û niv jî bi Tirkî hatibû nivisandin. A jî we re qasîhevîbûna 2.5 û 9.5'an a O. Kotan.

Berî her tiştî ez dixwazim diyar bikim ku munaqêşa min ne li ser pêwistiya "di rojnameyê de" pîrr nivisandina bi Kurdî an bi Tirkî ye. Munaqêşa min li ser rastî qebûlnekirina O. Kotan e. Ango berûvacîkirina rastiyê ye. O. Kotan rastiyê çawa berûvacî dike? Ezê yek û yek li ser îdeayê wî bisekinim.

Tiştêkî eşkere heye ku O. Kotan, di Kurdistan Press de terciha nivisandina bi Tirkî kirîye. Ji bo wî jî hevpeyvinên bi Kurdan re bi Kurdî tên kirin jî dike Tirkî. Mesela hevpeyvinê bi C. Talabanî, Ş. Xudo, Î. Ahmed, Dr. Qasimlu, Hêjar, Selah Bedrettin ûhw. O. Kotan çima wê

rastiyê qebûl nake û wê kêmasiya xwe davê ser nivîskar û hêzên Kurdan? Binêrin di wî warî de çi dibêje: "Kêmbûna Kurdî girêdayî bi xwedî derneketina nivîskarên Kurda ne. Ku jî bo rojname berpirsiyariyên xwe bi cî naynin". Şeref-xan Cizîrî!, Mahmûd Baksî!, û yên din, bi rastî li gor mantiqa O. Kotan hûn bîmesûltiyê dikin. Hûn Kurd in, nivisandina Kurdî jî dizanin, ma hûn çima bi Kurdî nanişînin? Bi Tirkî nivisandin daxwaza we ye an ya Kurdistan Press e? Divê hûn leka bemûsiliyatiyê jî ser xwe rakin!

Û O. Kotan Çiroka xwe weha didomîne "Xebatkarên Kurdistan Press, ne çirokvan, helbestvan, nivîskarên romanê ne, ne lêkolînger, dîrokan û ne jî zîmanzan in". Bi rastî kesê ku jî wan wesfan yekî bi cî bîne di nav xebatkarên K. Press de tune ye. Wê çaxê hûn çima rojname derdixin? Ji xwe re aşxaneyekê vekin. O. Kotan xebatkarê Kurdistan Pressê wê reben kirine ku meriv jî kanîna xwendin û nivisandina wan jî dikeve şikê.

Û Paşê jî wê îddîa xwe ya mezin dike: "Di rewşa îro de, bîguman, bo pêşdebirin û geşkirina zîmanê Kurdî baştirin û mezintirîn wesita Kurdistan Press e". Dê fermo wê xaçepîrsê hel bikin. Gelo li gor çî

K. Press baştirin û mezintirîn wesita pêşdebirina zîmanê Kurdî ye? Çima ne Berbang, ne Hêvî, ne Armanç, ne Roja Nû û ne yên din, bes Kurdistan Press?

Nuha jî ez werim ser îddîa O. Kotan ya li ser alînekirina siyasetan. Di wî warî de O. Kotan weha dibêje: "...Bi saya serê tembelî û lîxwedîderneketina hêzên siyasî û nivîskarên Kurd ew wezîfeyên jorîn li ser milên xebatkarên Kurdistan Press mane". Yên ku K. Press dixweynin baş dizanin ku K. Press jî hejmara xwe ya yekem heta îro bi hawakî fisgenîtiyê dijîtiya hêzên Kurd dike. Bi taybetî jî dijayetiya hêzên Kurdistanê Tirkîyê. Îcar bi çî rûyî jî siyasatên Kurd alîkariyê dipê. Ew jî baş dizane ku gelek siyasatên Kurd bi xwe rojname û kovaran derdixin û jî bo kovar û rojnamên xwe jî xwendevanan alîkarî dixwazin, lê belengaziyan weha jî nakin.

O. Kotan dibêje: "Hîn rêxistinên siyasî jî -ku xwedî rexne ne- Nûçeyên xwe bi şiklê belavokê û ne bi Kurdî, bi zîmanê Tirkî jî me re dişînin". Gelo rêxistinên siyasî, yên Kurdistanê Suriyê, Iraq û Iranê jî bi Tirkî dişînin. Ma zarok wê bi wê îddîa O. Kotan nekenin.

O. Kotan rexne li rêxistina PDK-I li Skandinavya jî digre û dibêje: "Weşanên xwe çima jî me re tercûme nakin". Ma mecbûr in?

Nuha jî ez werim ser neteweyetî ya K. Press. Gelo li gor kîjan pîvanê K. Press rojnameke netewî ye? K. Press rojnameke li derveyî

Bi Kurtî

SWÊD: Piştî du civînan di meha Çileyê Paşin de Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêdê hat damezrandin. Her di van civînan de komîteyek amedayî hat hilbijartin.

Li ser navê Komîta Damezrandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêdê daxuyaniyek belav bû. Di daxuyaniyê de sedemên damezrandina wê yekîtiyê weha tê diyar. "Rewşa aloz a Kurdistanê û êrîşa berdwam a dagirkeran û siyaseta qirkirina gelê me, bi taybetî piştî karesatên Kurdistanê yê wê dawiyê, erkeke niştîmanî û neteweyî yê giran dixê ser milê nivîskarên Kurd li derveyî welat ku hêz û karînen xwe bi kar binin jî bo parastina berjewendîya netewî û nasandina kultur û edebiyata Kurdî bi cihanê re û qelemên xwe berhevî xizmeta pêşdebirina kultura resen a Kurd bikin."

TIRKIYE: Di axaftina xwe ya civîna Parlamentoya Ewropayê de ku di 17'ê Çileyê Paşin de li Stabsbürgê çêbû parlamentê Partiya Sosyal Demokrat yê Meletyê Îbrahîm Aksoy got ku pêwîst e mafê kulturî jî Kurdan re bê dayin. Li ser wê gotina Î. Aksoy Partiya SHP dixwaze wî ceza bike.

Sê sal berê jî endamê Komîta Rêvebirina SHP Turgut Atalay gotibû ku pêwîst e programa partiyê bi zîmanê Kurdî bê nivisandin û li ser vîya Partiyê ew jî endametiya Komîta Rêvebirinê avêtibû.

SÛRIYE: Endamê Komîta Merkezî ya Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan û berpirsiyarê wan ê Rojhilata Navîn Dr. Xusrew Mistefa El-Xal di 31'ê Çileyê Pêşin de (Desember) li Şamê çavê xwe li jîyanê girt.

Dr. Xusrew di damezrandina Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan de jî cî girtibû û di navbera salên 1978-1983'an de berpirsiyarê Yekîtiyê yê Suleymaniyê bû. Dr. Xusrew 46 salî bû.

SWÊD: Di 15'ê Çileyê Paşin de li Breckê(bajarekî Swêd e) jî alî Kurdên Breckê şevê dostaniya Kurd û Swêdiyan pêk hat. Nêzîkî 250 Kurd û ewqas jî Swêdî di şevê de beşdar bûn.

Şevê bi Koma Zembilfroş dest pê kir. Koma Zembilfroş bi govendên dora Farqînê bala hemû temaşevanan kişand. Tiyatroya ku malbata Kurd û êrîşên leşkerên Tirk kiribû babetê xwe, tesîrek mezin li temaşevanan kir. Hozanê Kurd Şivan Perwer bi deng û tembûra xwe şev xemiland.

SWÊD: Di roja 29'ê Çileyê Paşin de li Stockholmê Federasyona Komelên Kurdistan li Swêdê li ser navê Berbangê jî bo zarokên Kurd şevê li dar xist, ku di navbera zarokan de mûsabaqa helbest, risim, çîrok û sitranan çêbû. Di şevê de bi sedan zarok û dê û bav beşdar bûn. Programa şevê bi piranî jî alî zarokan ve hatibû amadekirin.

Zarok bi dehan risim, çîrok, helbest û sitranan beşdarî şevê bûn û yên ku berhemên wan ketin derçê xelat wergirtin. Piştî mûsabeqê Berbangê pirtûk dan hemû zarokên ku di mûsabeqê de beşdar bûne. N.Rezazî jî di dawîya şevê de ji bo zarokan sitra.

welat e. Qada belavkirina wê Ewropaya ye, ne Kurdistan e. Bi biryara dezgeheke Kurd ya netewî dernakeve. Di warê zîman û naverokê de jî, jî netewatiyê dîr e. O. Kotan wê rastiyê çima vedîşere?

O. Kotan di destpêka nivîsa xwe de dibêje: "Xebatkarên wê rojname di nav rewşek gelek dijwar de rojnameke hefteyî derdixin". Gelo ew rewşa dijwar çî ye? Em hemû jî dizanin ku di warê aborî de tu problemên K. Press yê mezin tune ne. Ji ber ku alîkariya dewleta Swêd jî wan re dike, pê rojnameke wek K. Press dikare derkeve. Li aliyê din tu êrîş û tadeyên dewletê li ser K. Press tune ne. Wê "Medya Güneşi" êrîş naçin ser buroya wan, dezgehên wan talan nabin, xebatkarên wan di bin îşkence û zîندان de nînin. Dê îcar qesta O. Kotan bi rewşek "gelek dijwar" çî ye?

O. Kotan "rexna" xwe bi van gottinan diqedîne "... ew rexnen ku li K. Press tên kirin xwediyên wan hîn kesên din in". O. Kotan esas mantiqa xwe bi van gottinan dide dest. Ew jî qebûlnekirina rexna ne, hertim sûcê xwe avêtina ser kesên din e. Ji xwe O. Kotan bi xwe jî bi "rexne" yê xwe ne bawer e ku peyva rexne kirîye nav îşareta du neynokan.

Ez hêvîdar im ku O. Kotan dev jî wê mantiqa xwe berde û zarokan bi xwe nede kenandin.

(*) Min wê nivîsa han meh û niv berê jî Kurdistan Press re sandibû, lê heta nuha çap nekirine. Ez bi hêviya ku hunê wê nivîsê çapkin jî we re dişînim.

Deyîrê ma

Arêkerdax: Malmîsanij

MEHMEDE ALDUNÎ*

Leyro, leyro leyro, leyro leyro!
Leyro, leyro. Mehmedê mi!
Heywax leyro, Mehmedê mi!
Şefeqê sibay piro dano,**
Mihê mi keye ra radano.
Fekê goli verra dano.
Teres 'Elê Hesi bendedê Mihê mi di şono,
Kokê gozêr di çok dano,
Tifing Melay mi ra nano.
Dayê êre(yere) wo, rojawan o,
Melay mexrebî azan dano.
Xeberi hamey dewi miyano,
Vanî "kişiyawo Mehmedê Qasano",
"Kişiyawo axay Aldunijan o!"
Leyro, leyro, Mehmedê mi!
Heywax leyro, Mehmedê mi!
Gidî, mi va, wesar qediyawo, aminan o,
Honik o serê banano.
Yew veng yeno, yew veyn dano,
Biya piçpiça inê cenîyano.
Mi va, va yeno, vayê koyan o,
Hela war keno xiçe banano,
Derd û kulan ver pê dano.
Kişiyay zewncay birayano.
Hûmay nero(niyaro) seredê camêrdan o.

Serê Aldunî di leyek î,
Binê Aldunî di leyek î.
Pitê Mehmedê mi di seyek î,
Cenî ma mendî veyvekî.
Heywax leyro, torinê mi!
May to bimiro, çimsiyay mi!

Ma ko(kû) pitane xwi weye kî,
Ma veyvan kamî rî mare kî?
Ez vana, vana, to rî vana,
Derdê mi hinda koyan û royan o.
Derdê xwi ez xwi rî zana.
Ez menda dayka seyekanano,
Wa Hûmay nênanawo camêrdano.
Leyro, leyro, Mehmedê mi!
Heywax leyro, Mehmedê mi!
Serê Aldunî kerewo siya wo,
Binê Aldunî kerewo siya wo.
Kerga siyay ma rî veyn dawo,
Ocax ma rî tefenawo,
Berê keydê ma qefelnawo.
Leyro, leyro, Mehmedê mi!
May to bimiro çimsiyay mi!

*Na deyîrî zey vatişê yew dewijê dewa
Dêrey nusiyaya (Dêrey: yew dewa qezay
Piranî ya).

Vatişan gore na deyîrî kişiyayişê di
birayanê Aldunijan ser o vajiyaya. Nê
her di biray Key Qason (Qasan) ra yê
(Aldun: yew dewa qezay Dara Hênî ya).

**1975 di mi yewna varyantê na deyîrî
nuştî. Ay varyant di no qismê deyîrî
inawa wo:

"...Şefeq sibay piro daynî,
Mihê mi fekê goli verra daynî,
Teres 'El Hesi xwu bendedê Mihdê mi
naynî,
Tifing Mehmed mi ra naynî..."

ESKERÎ*

Eman, eman, eman, eman!
Eman, eman, Eskerî mi!
Eskerî mi ku ra şîyo(şîyû)?
Ez geyraya mi nêdiyo.
Ez vejeya(veciyawo) serê lewiyo,
Vejewo(veciyawo) şarê mi'niyo,
Ez hewneya (hewniyaya) vernî û
peyniyo,
Mi Eskerî te de nêdiyo.
Vanî Eskerî to(tû) Esker şîyo
De eman, eman, eman, eman!
Eman, eman, Eskerî mi!

Eskerî mi, ti ko(kû) esker şêrî;
Ti xeyr şêrî, silam bêrî.
Ti şêrî, bêrî, ti mi bigêrî.
Ti mi nigêrî, ti bira nêrî,
Kam rar durî yo, ti pi ra şêrî.
Ti wirdî çimandê xwi ra şêrî,
Ti riwen bî, ti 'er ro şêrî.
De eman, eman, eman, eman!
Eman, eman, Eskerî mi!

Teyri yena, teyray Muşî,
Pelê xwi dana kaş û kuşî.
Vanî "sewq kerdo eskerê Muşî",
Vanî "ha şono eskerê Muşî".
Gili başçawuşî birişî,
Nêverda ez biba dayka derguşî.
De eman, eman, eman, eman!
Eman, eman, Eskerî mi!

Ez şona berbê dikanano,
Ez nuştîş dana mektubano,

Erşawena taburi miyano.
Eman, eman, Eskerîyo!
Eskerî mi, Pirdê Palî yew tîrî yo,
Mi meqes girot yew birîyo(?)
Pance pancey yê ayrî yo
Saykî ez cenîya yey a marî yo.
Eskerî mi sera şîyo?
De eman, eman, eman, eman!
Eman, eman, Eskerî mi!

De Pirdê Palî pirdo text o,
No(Inû) İsmet Paşa yew kerro
bêbext o.

Nêverdano xortî bêrî wexto.
Eman, eman, Eskerîyo!
Eskerî mi, ez nêweş û tewgiran o.
Cila mi b'ancê bindê bexçano,
Rakê seyda nalwêran (nalbêran) o.
Ez derde tewa xwi may xwi rî vano.
Ez bi ino hal şona ordî miyano.
De eman, eman, eman, eman!
Eman, eman, Eskerî mi!
Eskerî mi "qirç bîrî"*** mi.

*Na deyîrî zey vatişê yew dewijê
dewa Dêrey nusiyaya (Dêrey: yew
dewa qezay Piranî ya).

**qirç bîrî: (Tirkî di) mêrdimo ki 1941
di marda xo ra biyo.

Na deyîrî ra fahm beno ki Eskerî
1941 di marda xo ra biyo. Eke ma vajê
o vîst serreyeya xo di şîyo esker, fahm
beno ki na deyîrî 1960 di yê ser o va-
jiyaya.

ZIRAVÊ

Zirav, Zirav, Ziravê; leylo, leylo Ziravê
Zirav, Zirav, Ziravê; exşîkê, kafirbavê

Ziravê 'Elîpar'î, leylo leylo Ziravê
Delalê 'Elîpar'î, day delîlê Ziravê

Zirav şînî qesarî, leylo leylo Ziravê
Delal şînî qesarî, day delîlê Ziravê

Kotînî bostonê şarî, leylo leylo Ziravê
Kotînî bostonê şarî, day delîlê Ziravê

Kona Hefsê Pêçar'î**, leylo leylo Ziravê
Kona Hefsê Pêçar'î, day delîlê Ziravê

Semedê şîlê xiyarî, leylo leylo Ziravê
Semedê tovê xiyarî, day delîlê Ziravê

Zirav waştîya mi biyênê, leylo leylo Ziravê
Zirav waştîya mi biyênê, day delîlê Ziravê

Şew û roj hesret biyênê, leylo leylo Ziravê
Şew û roj hesret biyênê, day delîlê Ziravê

Zirav, Zirav, Ziravê; leylo, leylo Ziravê
Zirav, Zirav, Ziravê; exşîkê, kafirbavê.

* Na deyîrî (dêrî) zey vatişê yew dewijê dewa Xo-
sorî(Yalimli)

nusiyaya. Xosor, qezay Liji ser o ya.

** Pêçar (Guldiken): Yew dew a, qezay Liji ser o
ya.

AWA KAŞON XUŞENA

Li minê, oy oy, li minê, lê; li minê, oy oy, li minê!
Li minê, oy oy, li minê, lê lê; cêr û cor surmeliyê!

A (Aya) kom a cêr o yena? Oy, li minê, oy oy, li minê!
A kom a cêr o yena? Lê lê, cêr û cor surmeliyê!

Awa kaşon xuşena, oy; li minê, oy oy, li minê!
Awa kaşon xuşena, lê lê, cêr û cor surmeliyê!

Kênek ver d'(di) desmac gêna, oy oy; li minê,
oy oy, li minê!
Kênek ver d'(di) desmac gêna, lê lê; cêr û cor surmeliyê!

Li minê, oy oy, li minê, lê; li minê, oy oy, li minê!
Li minê, oy oy, li minê, lê lê; cêr û cor surmeliyê!

*Na deyîrî (dêrî) zey vatişê yew dewijê dewa Xosor'î (Yalimli) nu-
siyaya. Xosor, qezay Liji ser o ya.

ZERÎ ZEYNEBÊ

Zerî Zeynebê, Zeynebê; zerî Zeynebê, Zeynebê!
Zerî Zeynebê, Zeynebê; zerî Zeynebê, Zeynebê!

Ti b' Zeyneba gulgulî; zerî Zeynebê, Zeynebê!
Ti b' Zeyneba gulgulî; zerî Zeynebê, Zeynebê!

Serê Bircig'î** mazac o; zerî Zeynebê, Zeynebê!
Binê Bircig'î mazac o; zerî Zeynebê, Zeynebê!

Derdê xortan zewac o; zerî Zeynebê, Zeynebê!
Derdê keynan yew lac o; zerî Zeynebê, Zeynebê!

Ti yena, ez to(tû) bero; zerî Zeynebê, Zeynebê!
Ti nîna, ez se kero? zerî Zeynebê, Zeynebê!

*Na deyîrî zey vatişê yew dewijê dewa Dêrey nusiyaya
(Dêrey: yew dewa qezay Piranî ya).

**Bircig: Yew dewa qezay Palî ya. Devletî Tirkî namey
na dewi bedelnawo, kerdo Karatay.

SAN

Arêkerdax: Firat

Ûle(Ölle) biye ax biye, biye ge(ke).
İsanê na zaman de keş te nêmento bext û şîye.
San* Axayê mi, Bepixar (Bezbezar) o.
San Axayê mi, vala(viyala) teke.
San vano: "Ez merdena ho(xo) ver nîkonû,
Esker yeno, Koyê Dersîm de nêmano
cînik û çenekî."

Sana vano: "Dî serey(serî) ardî vênay mi ra
Jû yê Alîşêr Efendî yo, jû yê Xanim o!"

De bira biye, ax leminê, biye!
San Axayê mi merdo nêmerdo,
Şikiyo dîle zîwanê Kirmancîye.

San Axayê mi koyê ho ki roto,
Şîyo geçê Koyê Mûzirî.

San vano Qozanico ra: "Bêbextîye mekerê,
Ma pa (piya) werdo qirbanê Xizirî".

Bira, Xozat'î persena, Qerexlan ra nat o.
San vano Lazê Lilê Pirçoy ra: "Misewre meke,
Min û tu cizikê Gulizarê** pa (piya) lito."
Haqo! Ti cora (coro) keş ra nêdê dayene,
Cora biray berdo sarê biray mezat de roto?"
San Axayê mi, tu merdena ho ver mekûye,
Hesen Axa'y to ra raver hêfê to gureto.

*San(Sahin): 1938'di koyanê miyanê Xozat'î û Zerenik
(Ovacix) di ver a eskeranê Tirkî lej kerd. Peynî di Tirkî
biray San'î xapêna, yê hewn de San kîşt û serey ci berd
Xozat. Labelê merdîmanê San'î na xebirê eşnawitî, şî raya
Xozat'î ra heyfê yê girewtî, qatîlê San'î kîşt.

**Gulizare: Maya San'î.

ÎZEHÊNDÛ MECBÛRÎ

Eke şîma nê îzehê min ê mecbûrî kovara(dergîya) xo di neşr bikerê ez keyfweş bena û nika ra şîma rê teşekkür kena.

Semedo ki kovaranê Ayre û Pîya di tay nuştay mi vejîyay, merdim vano qey ez zî fikrê nê embazan mudafe kena. Semedo ki kovara Pîya ebi xebata xo tarîxî revîze kena, raştan çewt kena û şarê ma mîyan di toxumanê ciyayey ramena ez bincaran eleqey xo Pîya'y ra birnena.

Ez hêvî kena ki embazê erjaye yê ki nuştay yîni Pîya di vejîyay yan zî vejîyênê raştanê tarîxîyan ser o vinderê, pey enasar dekan nêxapiyê, merdimanê niyetxiraban dim a nêşêre, fahm bikerê ki cay ma timo şarê ma het o û ver a merdimanê niyetxiraban vinderê.

Embaz E. Pamukçuyo erjaye wa ewro ra pey bincaran eseranê mi neşr nêkero.

Ebi hurmetê mi...*

31-01-1989

Usxan

* No nuştay embaz Usxanî bi xo Tirkî bi, ma tada Dimilkî-Armanc.

ZORUNLU BÎR AÇIKLAMA

Bu zorunlu açıklamamı yayın organınızda yayınlarsanız çok memnun olurum, şimdiden teşekkür ederim.

AYRE ve PİYA'da yayınlanan eserlerimden dolayı, benim de bu arkadaşlarla aynı düşünceyi savunduğum kanısı uyanmıştır. Tarihi revize ederek, gerçekleri saptırarak halkımızın arasına ayrılık tohumları eken faaliyetlerinden dolayı PİYA ile olan bütün ilişkilerimi koparmış bulunmaktayım.

PİYA'da eserleri yayınlanan ve yayınlanacak olan değerli arkadaşların, tarihi gerçekleri inceleyip bu tür oyunlara kanıp niyeti kötü kişilerin peşinden gitmemelerini, yerimizin sürekli halkımızın yanı olduğunu kavramalarını, art niyetli kişilere karşı tavır almalarını dilerim.

Sayın E. Pamukçu arkadaşın bundan sonra benim eserlerimi kesinlikle yayınlamamasını dilerim. Saygılarımla...

31.01.1989

Usxan

Xaçepirsa bi diyari

Gelek kesî ji me re bersivên xaçepirsê şandin, hin kesan bi temamî û hinan ji bi çend xeletîyan xaçepirs tişê kirine. Kesên ku me ew hejaye zelatê ditine ev in: Sofî (Swêd), Arîf (Swêd), Hecî (Swêd), Dr. Ferhad (Bulgarîya), Jêhat (Danîmarka).

Çeperst: 1) a- rexne, b-baz, c-Pûşkin. 2) a-enî, b-awanî, c-êrîş. 3) a-vîze, b-aborî, c-girav. 4) a-ar, b-ne, c-eneg. 5) a-ecnep, b-tekane, c-arûb. 6) a-war, b-Kardox. 7) a-awa, b-zer, c-şe, d-dawî. 8) a-parasî, b-Şam, c-dra, d-tu. 9) a-nepek, b-ayep. 10) a-evî, b-êre, c-riz, d-pine. 11) a-girar, b-tîk. 12) a-îrim, b-nîrfe, c-ak, d-ûd. 13) a-dad, b-narin, c-şiv, d-di. 14) a-îh, b-dav, c-îşk, d-kî. 15) a-zom, b-le, c-ris, d-emo, e-rêl. 16) a-aza, b-bor, c-trix, d-ava. 17) a-Nihat, b-ab, c-et, d-neh. 18) a-amîr, b-bapîr, c-av.

Serejêr: 1) a-revde, b-ap, c-Mehdî Zana. 2) a-enî, b-ciwan, c-aho, d-im. 3) a-Xîzan, b-ar, c-egîd, d-mahî. 4) a-erew, b-vir, c-zar. 5) a-ea, b-parskirin, c-lat. 6) a-Wan, b-amade, 7) a-babet, b-nêr, c-ra, d-bab. 8) a-ano, b-emeşer, c-nivro. 9) a-zîrek, b-raperîn, c-îrap. 10) a-înak, b-me, c-is, d-bî. 11) a-pê, b-enaş, b-krif. 12) a-ûr, b-çered, c-eşkere. 13) a-şig, b-raz, c-mita. 14) a-kşim, b-oday, c-tav, d-ox. 15) a-axa, b-epik. 16) a-pik, b-Îranî. 17) a-avrû, b-îl, c-ûd, d-êve. 18) a-aş, b-eba, c-Ubeydillâh

Dema hilbijartinê...

Destpêk r.1

hîn hukmê xwe dimeşînin. Qedexetîya li ser sendîqan û mîfên kirêkaran yê din dom dîkin. Ji bilî mistek dewlemendan, piraniya mezin a civakê ji mafê azadiya rêxistinî û fikireşkerekirinê bêpar e. Îşkence, berdewam e di esase warê tehqîqat û mehkeman de.

Tadayî û zilma bê hed û hudûd a hêzên nijadperestên kolonyalist ku li Kurdistanê bikar tînin, ber dewam e. Dawiya girtina ser gundan, bindestkirin û îşkencên kêfî (bê sebeb) û qetlîama nayê. Eşqiyayên kolonyalist dev ji hewildana derxistina gelê me ji erdê wî, wendakirina ziman û kultura me, şexsiyeta me ya milî, bernadin.

Hêzên çep û demokratîk, welatparêzên Kurd, di van hilbijartinan de jî ji wî mafî bîparin ku di warê legal de xwe bi rêxistin û bi serbestî bîr û baweriyên xwe eşkere bikin. Loma jî hilbijartinên 26'ê Adarê jî wek yê berê wê bibe meydana cîrda partiyên burjuwazî yê heyî.

Lê belê ev hemû jî, giringiya hilbijartinan û ya xebata dema hilbijartinan ji holê ranakin.

Berî her tiştî hêzên pêşverû û demokrat, kesên me yê welatperwer, dikarin ji vî fêde bigirin û pêwendîyan bi gel re xurtîr bikin, xebata eşkerekirin rûşîya rejîma faşîst a kolonyalist û ya propagandayê xurtîr û berfirehtîr bikin. Ev firsetek e ji bo eşkerekirina sedemên krîza aborî, yê birçîbûn, belengazî û terorê. Her wiha dema hilbijartinê îmkaneke çêtir dide ku hêzên demokrat ên Tirkîyê û Kurdistanê werin nik hev, xebatek muştêrek bikin. Em ji vî fêde bikin. Li cihên ku îmkaneke rê didin, berî her tiştî em namzedên muştêrek ên serbixwe pêşkêş bikin. Eger ev îmkaneke nîne, yan jî berjewendîya tevgera welatparêz a demokratîk wiha dixwaze, em hewl bidin, alîkarî bikin ku namzedên pêşverû û welatperwer bîr hilbijartin ên ku çî serbixwe û çî di partîyan de bîr.

Em hilbijartinan bikin platforma xebata siyasî ya jîndar û ya muştêrek.

Şeva piştigiriya multeciyan

Di 7'ê Çileyê Paşîn de li Stockholmê şevêk ji bo piştigiriya multeciyan Kurd ku ji ber çekên kîmyayî koçkiribûn, hate organîzekirin. Nasir Rezazî, Bîrîndar û Rojhat wek dengbêj û Koma Dîlan di şevê de beşdar bûn.

Divê Hukûmeta Swêd alîkariya Kurdan bike!

Di 25'ê Çileyê Paşîn de du parlamenterên Partiya Moderat (Muhavazakar) li ser pîrsa Kurdan hinek pêşniyarî dan meclîsê.

Eva Björne û Gullan Lindblad di hazîrkirina bîngêhen pêşniyarên xwe de bi dîr û dirêjayî li ser rewşa Kurdan û Kurdistanê disekinin.

Ew di pêşniyara xwe de dibêjin ku ji 1920'î û vîrda Kurdan gelek

Li Kurdîstanê..

Destpêk r.1

terora li hemû Kurdistanê ye.

Di dawîya sedsala 20'an de heger dewleta Tirk bi însanên me pîsiyê dide xwarin, ev, bes ne îspata barbarî û hovîtiya burjuwaziyê Tirk îspat dike, her wisa ev nîşana nêzîkbûna mirina wan e jî. Ew çiqas ji însanîtiyê derdikevin bira derkevin wê nikarbin îrade gelê Kurd ji ortê rakin.

caran serî hildane, lê her carê jî serîhildanên wan ji aliyê dewletên serdest û ordiyên wan ve bi hawakî hovîti hatine şikandin û di van serîhildanan de, çî kesên ku tevî serîhildanê bûne û çî jî kesên sîvil, hatine qetilkirin.

Di dewama pêşniyarên xwe de parlamenter li ser rawestandina şerê Îran û Iraqê disekinin û bi kurtî weha dibêjin; piştî sekinandina şerê Îran û Iraqê, Iraqê bi hemû hêzên xwe û tevî çekên kîmyayî erîşk mezî bir ser Kurdistanê Iraqê û nêzî 100.000 kesî mecbûrî derbasbûna Tirkîyê kir.

Her du parlamenter dibêjin ku Tirkîyê dibêje ne Kurd, ne zimanê Kurdî û ne jî Kurdistan heye, wê çaxê çima Kurdan qebûl kir? Tirkîyê bi vî yekê dixwaze xwe li Ewropayê wek welatê hurmetkarê heqê însan bide xuyakirin ji bo ku bikaribe bibe endamê Civata Aborî ya Ewropa.

Her du parlamenter li ser danûstendinên Iran û Iraqê disekinin û vekirî weha dibêjin; eger ku li Rojhilata Navîn aştiyek bi îstîkrar tê xwestin ew bîyê qebûlkirina heqê Kurdan ne mumkun e.

Piştî van argumentên xwe daxwaz kirin ku meclîs ji hukûmetê van daxwazên jêrîn bike:

1- Divê hukûmet di tîkiliyên xwe yê navnetewî de bi hawakî aktif mesela Kurdan di danûstendinên aştiya di navbera Îran û Iraqê de bîne rojevê û biparêze.

2- Divê hukûmet bi wasita dezgeyên musaîf alîkariyê bi kampên Kurdan û gundên Kurdan re bike.

3 - Divê hukûmet bi tîkiliyên xwe yê navnetewî zorê bide rejîmên Tirkîyê, Îran û Iraqê ku hurmetê ji heqê însanîtiyê re bidin nîşandan.

Çend gotin li ser rewşenbîriya netewî û problemên wê

Destpêk r.5

Kurdî. Li vir vatîniyên herî mezin dikevin ser rewşenbîrên Kurd-zimannas, dîrokzan, sosyolog, etnograf ên ku hemû nîrxên mîletê Kurd bî cihêkirina van li gora mintiqan, zaravan, perçe û hwd. bi lêkolînên ilmî van pîrsan bidin îzehkirinê.

Ronesans, di dîroka hemû neteweyan de rolek weha leyîstîye. Û her neteweyê di çêbûn û pêşketina xwe ya tabî de di demekê de digihê ronesansa xwe. Ronesans, ençamek kombûn û pêşveçûn, nîrx, zanîn, tecrube û hemû heyînên netewî ye.

Di komkirin û belavkirina tecrube û zanînen neteweyekî de barê herî giran li ser milên rewşenbîran e, ew peyvkâr û xebatkarê wê demê ne. Ew Ehmedê Xanî, Mehmed Beyazîdî, Xelîl Xeyalî, Cela-

det Bedirxan e.

Ji ber ku ew dem dema xwedîlêderketina nîrxên netewî ye, zîman, dîrok, çand, huner, ol, tradîsiyon, urf û edet, qehremanên netewî, sembol û hwd., xebatkar û peyvkârê wê demê jî rewşenbîrê netewî ye.

Helbet, di berevkerin, pêşxistin û belavkirinên nîrxên netewî de rewşenbîrê netewî, pêwîstiyên dema xwe tevî van dike. Ji bo wîlo, komkirin û berevkerina nîrxên netewî bîngêha nûjenkirin û pêşdebirina van e.

Erê rewşenbîrê Kurd parêzgerê xweserî û her weha nûjenkirê civata xwe ye. Peywendiyên sosyali bî dîtin, tewr û awayê jiyanê ya rewşenbîrî tîr guhertin. Vêca, ta ciyekî îro rewşa rewşenbîriya Kurd çawa be, ew wisa tesîra xwe li ser îroyîn û pêşeroja civata xwe dike. Peywendiyên nûjen, hev-

demî, demokratîkî û humanîstî, ji hev fehmîkirin û dostaniyê, sibê wê bibe peywendiyên civata wî.

Rewşenbîr bi hewilkarî û hilavtînen xwe yê îroyîn pêşeroja civata xwe çêdikin. Avakirina serxwebûn, kêfxweşî û jiyanek azad a netewê Kurd ji îro ve destpêkîriye. Çêkirina dewletê wê bibe helqeyek pîr girîng a vî pîvajo. Lê, civata Kurd bi her awayî girêdayî wê pîrsê ye: gelo, îro rewşenbîrê Kurd çawa ye, çî karî dike? Xebat û berhemên rewşenbîrên Kurdan bersîva gûrkirina şîyarbûna netewî didin yan na? Pêwîst e gotûbêj li ser bîngêha van pîrsan bî kirin. Xebat û jiyan bi dem û bi realîtiyên xwe, van pîrsan pêwîst dike.

Pêwîstiyên wek, realîstbûn, xwe xelaskirin ji daxwazên bes hisî, xem û xeyalan, nêzîkbûn bi realîtiya civata xwe û hwd.

Rewşenbîrê Kurd ji bo rakirin û hilweşandina bîrmayiyên kevneperestî yê dij-pêşveçûn, dijî tarîfî û cahiliyê şer dike. Îro ji do bêtir, rewşenbîrên Kurd ji îman û bîr û baweriyên fanatîk, tercîha xwe ber bi rasyonelîzm û ilim dike. Nûjenkirinê diparêze, lê ji tecrûbeyên xwe yê bî eş, nûjenkirinê êdî li ser bîngêhen nîrxên netewî pêwîst dibîne. Parastina tradîsiyonên netewî di şertên mîtingehî de bûye sîper li dijî dîlîti, mîjûşûştin, kêmdîtin û tunekirinê. Li hember "medeniyet" û "jiyana modern" a kolonyalistan rewşenbîrên netewên bindest bî şik van tradîsiyonan hembêz kirine û pêşve birine. Di wan de serbilindîya netewê xwe dîtine, netewê xwe şîyar kirine. Di dema şîyarbûna netewî de parastin û belavbûna van nîrxên netewî bi rênasiyêke bî rîkûpêk a welatparaziyê çêdibe. Welat-

parêzî wek pêwîstiyek dîrokî di dema şîyarbûnê de rola xwe ya herî girîng dîlîze.

Rewşenbîrê Kurd êdî dest bi tîgîhîne kirine ku pêwîst e rîya xwe bi xwe xêz bike. Pêşveçûna şîyarbûna netewî dîtina pêşdebirina ilim, wêje, çand û hunermendî û siyaseta Kurdî li ser esase pêvajoya hizirkirina tabî ne û di nav kar û xebat, afirandin û xwe eşan-din û xwe danîna ber bi van xebatan da çêdibe.

Salên pêşerojê bi hêviyên tîjî û baş barkirî ne. Rewşenbîriya Kurdî rola xwe ya dîrokî wê di civata Kurdan de bîlîze. Îcar wê çaxê van bîrmayiyên çandî-civakî yê sedsalan, nîrxên hemwelatbûnê, bi wan serbilindbûn û psikolojiya me ya tevliheviya îroyîn wê durust be, wê çaxê, emê hê baştir û rewşenbîrtir bi hev û dû re bidin û bîstînin.

149 dewlet li dij çekên kîmyayî li hev kirin

Hesen Mizgîn

Di hefta duyemîn a meha Çileyê Paşîn a 1989'an de, li Parisê bi piraniya endamên NY(Netewên Yekbûyî) li ser çekên kîmyayî konferansek hate pêkanîn. Wek tê zanîn di sala 1925'an de li dij bikaranîna çekên kîmyayî li Cenevreyê protokolek hatibû îmzekirin. Di wê demê de hin dewlet îmzeyên xwe neavêtibûn vê protokolê.

Bi deklarasyonekê, dawî li Konferansa Parisê hat. Li gor vê deklarasyonê, 149 dewlet li ser 6 nîqteyan li hev kirin. Di nav van dewletan de Iraq jî heye.

6 noqteyên ku li ser hat li hev kirin

1- Mehkûmkirina bi her awayî bikaranîna çekên kîmyayî. 149 dewlet garanti didin ku wê çekên kîmyayî bi kar neynin û dewletên ku çekên kîmyayî bi kar anîne mehkûmbikin. Peyman bikaranîna çekên kîmyayî ji bo "xwe parastinê" qebûl nake.

2- Qebûlkirina Protokola Cenevreyê ya sala 1925'an û derbasbûna wê ya ji bo dahatû jî. Konferans bang dewletên ku îmzeyên xwe neavêtine protokolê dike ku îmzeyên xwe bavêjin.

3- Dewletên li Konferansa Parisê beşdarbûyî berê xwe didin gotûbêja li Cenevreyê "du car ji her demê zêdetir hewl bidine xwe ku rojek zûtir Peymana Cenevreyê a qedexekirin, hilberin, depokirin, pêşdebirin û bikaranîna çekên kîmyayî, amade bike".

4- Heya ku Peymana Cenevreyê bête amadekirin, bila hemû dewletên ku xwedî çekên kîmyayî ne bi berpirsiyar bin û hilberîna rawestînin.

5- Bila alikariya Sekreterê NY bête kirin da ku sûcên ku li dij Protokola Cenevreyê ya sala 1925'an çêdibin lêbikole.

6- Dewletên li konferansê beşdar in, daxwaz dikin ku

"bi gelemperî û bi temamî çekdaxistin" bibe.

Wek tê zanîn Iraq di şerê Iranê de, di navbera 1984-88'an de, çekên kîmyayî bi kar anî. Iraq ne tenê li dij Iranê lê li dijî gelê me Kurdan jî çekên kîmyayî bi kar anî. Li Helepçê 5000 Kurd bi bombayên kîmyayî hatin kuştin û bila qet şika me jê tunebe ku bi sedan Kurdên din ên li herêmên din jî bi van çekên xedar hatine kuştin, lê belê ji ber tunebûna belgan û hin tengasiyan ev yek negihîştîye destê me.

Belê îro Iraq weke ku yê ku çekên kîmyayî bi kar tîne ne ew be îmza xwe avêt deklarasyona Konferansa Parisê. Iraq di sala 1972'an de jî îmze avêtibû biryara navnetewî ya li dij bikaranîna çekên biyolojîk. **Lê îro Iraq çekên biyolojîk li dij gelê me bi kar tîne. Belê ev yek hatiye îspatkirin jî. Li gor kovara Jane's Defence Weekly li Londonê, fabrika çekên biyolojîk li bajarê Salman Pakê ye. Şirketên Televîzyonê yê DYA jî, li gor agehdariyên ku ji istixbarata DYA stendine, iddia dikin ku Iraq li dij Kurdan çekên biyolojîk bi kar tîne. Kurdên dorhêla Suleymaniyê hê jî meha Îlona 1988'an ajansên Ewropî agahdar kirin ku bi sedan Kurd jî tifo û kolera dimrin. Rojnamevanekî Ingilîzî di gera xwe ya li Kurdistanê hin belga jî civandî. Li gor vî rojnamevanî, xelk li teniştê avên vexwarinê kîsên ji plastîk ku li ser maddayên nenaskirî nivîsandî, dîtine.**

Li gor Daira Lêkolîna Leşkerî ya Swêdê, Iraq jî mîj ve ye ku dixwaze çekên biyolojîk çêbike. Îcar Iraq herçend îmze bavêje deklarasyonên navnetewî jî nayê wê manê ku wê çekên kîmyayî bi kar neyne.

Iraq di çekirina çekên kîmyayî û biyolojîk de alikariyek mezin ji Tirkîyê



stend. Transporta materyalên çekên kîmyayî û biyolojîk ji alî hin şirketên Tirkî hatin kirin. Hukûmeta faşîst a Tirkîyê bi vî agahdar bû û heya îro jî Iraq materyalên çekên kîmyayî û biyolojîk di ser Tirkîyê re tîne.

Li gor hin agehdariyên din, Iraq ev 30 sal in ku çekên kîmyayî bi kar tîne. Piştî encama Konferansa Parisê di dest de tu garanti tuneke ku Iraq çekên kîmyayî bi kar neyne. Ev 17 sal in ku li Cenevreyê danûstendin dibin ku komîsyonek ji bo kontrolkirina çekên kîmyayî bête avakirin. Lê pir mixabin jî bo avakirina komîsyoneke wiha demek din divê. Eger komîsyonek bête avakirin, li her welatên ku encamên Konferansa Parisê qebûl kirine, mirov dê bikaribe xurdekirina çekên kîmyayî kontrol bike yan jî kîjan dewlet bi dizîka çekên kîmyayî çêdike wê komîsyon bikaribe eşkere bike.

Xebatên ji bo qedexekirina çekên kîmyayî

Pêkhatina vî konferansê li ser pêşniyariya François Mitterand bû. Lê berî vî yekê jî gelek caran ji bo civînek wiha û qedexekirina çekên kîmyayî pêşniyar û xebat hatibûn kirin.

Di 19ê Hezîrana 1985'an de Partiya Yekîtiya Sosyalîst (SED) a Komara Almanyaya Demokratîk û Partiya Sosyal Demokrat a Komara Almanyaya Federal bi hev re deklarasyonek beyan kirin. Di vî deklarasyonê de her du alî jî daxwaziya afirandina korîdorekê ji çekên kîmyayî azad dikirin. Li gor vî pêşniyarê dewletên li navça Ewropayê, Belçîqa, Çekoslovakya, DDR, Komara Almanyaya Federal, Luksembûrg, Hollanda û Polonya diketin korîdora ji çekên kîmyayî azad. Van dewletên han wê welatên xwe jî çekên kîmyayî paqij bikra, ne wê çekên kîmyayî çêkîra û ne jî wê rê bidana transporta van çekan.

Bi rastî ev pêşniyar di cî de bû û pêşniyareke bi aqil bû. Mirov dikare bibêjê ku îro Ewropa depoya çekên kîmyayî ye. Şaştîyek biçûk dibe sebaba mirina an jî sequebûna bi milyonan insan. Hema mirov tenê bûyerên li ser Seveso û Bopalê û vî dawiyê bikaranîna çekên kîmyayî ji alî Iraqê li dijî gelê me bîne bira xwe, dê fêr bike ku çekên kîmyayî çî xeddar in.

Di qedexekirin, bikaranîna çekirina çekên kîmyayî de Yekîtiya Sovyet rolek pir girîng leyst. Hem berî Şerê cihanê yê Duyemîn û hem jî piştî vî şerî YS pêşniyar anî ku çekên kîmyayî bêtin qedexekirinê. YS vî pêşniyara xwe di sala 1971'an de carek din pêşkêşî NY kir. Di sala 1972'an de YS pêşniyara xwe jî nuh ve kir. YS di navbera 1976 û 1980'ê de bi DYA re li ser qedexekirina bikaranîna çekirina çekên kîmyayî, gotûbêjên dualî kirin. Yekîtiya Sovyet di sala 1982'an de carek din pêşniyara qedexekirina çekirin û depokirina çekên kîmyayî anî û xwest ku çekên kîmyayî bi tevayî bêtin xurde kirin.

Yekîtiya Sovyet bi pêşniyara xwe ya herî dawî ku li Konferansa Parisê hate pêşkêşkirin, bala hemû dinê kişand û dilê aşîrxwazan xweş kir. Wezîrê Derve yê YS Edward Şewardnadze, di Konferansa Parisê de beyan kir ku wê YS çekên xwe yê kîmyayî jî holê rake. Bi vî biryarê YS carek din daxwaziya xwe ya aşîyê îspat kir.

Ji aliyê din DYA, di destpêka Konferansê de bi iddiaya çekirina bombayên kîmyayî êrîş da ser Lîbyayê û du balafirên Lîbyayê daxist jêr. Lê bi rastî yê ku berî herkesî çekirina bombayên kîmyayî didomîne û yê ku van bombayan nûtir dike DYA bi xwe ye. Divê DYA pêşî jî xwe dest pê bike. Divê DYA pêşî depoyên xwe yê bi bombayên kîmyayî tijekirî jî holê rake, piştî re jî yê din gazinan bike. Li gor agehdariyên resmî, hikûmeta DYA niha çekên kîmyayî bi hawakî modernîr çêdike.

Fîşa abonetiya Armancê

- ☐ Salek
☐ Şeş Meh

Abonetiya salekê

120 Skr. 120 FF. 20 \$ 35 DM

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişnin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji me re bişnin.

Adres: P.Box: 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden